# HUZNA ŞEVÊ

**Seyfedînê Welekorî**

**helbest**

'ar

**AR YAYINLARI & WEŞANÊN AR**

**Ar Yayınları & Weşanên Ar** (90)
Helbest

HUZNA ŞEVÊ
Seyfedînê Welekorî

**Edîtor**
Mevlut AYKOÇ

**Redekte**
Berhîm PAŞA

**Berg**
Jîr Jan AMEDÎ

**Çapa Yekemîn**
..............................

ISBN: ..........................

**Matbaa**
Bizim Büro Matbaa Dağıtım Basım Yayıncılık San. ve Tic.
LTD. ŞTİ. Büyük Sanayi 1. Cad. Sedef Sok. No: 6/1
İskitler / ANKARA

***Ji xeynî danasînê, bêyî detûra nivîskar bi tu awayî nayê zêdekirin.***

**Ar Yayınları & Weşanên Ar**
Kocatepe Mah. Taksim Çeşmesi Sok. No: 6 / 2
Beyoğlu İSTANBUL
**Tel - Fax:** 0 212 237 16 07 - 0 507 455 52 16

**E-mail:** ***wesanenar@hotmail.com***
***aryayinlari@gmail.com***

# HUZNA ŞEVÊ

## Seyfedînê Welekorî

**helbest**

ar
AR YAYINLARI & WEŞANÊN AR

# NAVEROK


Pêşek (Jîr Jan AMEDÎ) ....................................................7
Kurtejiyan ....................................................................8
Spasî & Diyarî ..............................................................10
Pêşgoton ......................................................................11


## *HELBEST*


Pênûsa Min ....................................................................13
Biharistan ......................................................................16
Piştî Tu çûyî ..................................................................18
Rihê ...............................................................................20
Bajarê Xeman Roboskê ...................................................22
Hatina Te .......................................................................23
Bêdewletî me ................................................................24
Agirê Nava Min .............................................................26
Lê Tu Çûyî ....................................................................27
Ax Cizîra Min ...............................................................28
Dêrsim ..........................................................................30
Bêrîvan .........................................................................34
Hey Zalimê ....................................................................37
Elîf ا ..............................................................................38
Ey Bayê Kur (1) .............................................................40
Dil Çi Ye .......................................................................42
Îroj Hewa .......................................................................43
Ey Bayê Kur (2) .............................................................44
Wa Dîsa Bû Êvar ............................................................46

Dayê ....................................................................47
Porê Te ..............................................................50
Gundo ...................................................................52
Gulistana Min .....................................................54
Hekîmo ...............................................................56
Keçika Cînar ..................................................... 58
Huzna Şevê .........................................................59
Kobanê ...............................................................60
Navê Min ............................................................61
Menale ................................................................62
Qamişlo ..............................................................64
Ka Were ..............................................................65
Mirin ...................................................................66
Tu Niha Li Ku Yî ...............................................68
Hesekê ................................................................69
Rêwiyo ...............................................................70
Seydayê Min .......................................................72
Ewrê Evînê .........................................................73
Te Digot Min Ji bîr ve Bike ...............................74
Min Gote Gewrê ..................................................76
Welatê Wenda ......................................................79
Amed ..................................................................80
Bêbextê ...............................................................81
Bêmiraz Çû .........................................................82
Dîlbera Min ........................................................83
Dil .......................................................................84
Êşên Min .............................................................85
Gewrê .................................................................86

Hebestvano ..........................................................87
Wê Ew Roj Bê ......................................................88
Hûn dizanin ..........................................................90
Ey Bilbila Baxê Min ...............................................92
Ez Çiqas Têm Kuştin ..............................................94
Hey Şevên Reş ......................................................96
Ey Rebê Dilovan ...................................................98
Kaniya Dilê Min ....................................................99
Kurd û Mirin ........................................................100
Delalê ..................................................................102
Lê Tu Nehatî ........................................................104
Mîro ....................................................................106
Nalînek Tê Ji Kêleka Min .....................................108
Şoreşger ..............................................................110
Xayînê ..................................................................112
Qedera Reş ..........................................................113
Piçûko ..................................................................114
Ez Mirov im .........................................................115
Zînê .....................................................................116
Xeyalperestê .........................................................118
Pênûsa Şikestî .......................................................120
Zarok ...................................................................121
Lê Zerî Dotmamê ..................................................123
Min Îşev ...............................................................126
Nabe ....................................................................128

## PÊŞEK

Dibêjin ku "Retorên" (dengbêj) Yewnanî berî ku di nav gel de çîrok û gotinên xwe bêjin, diçûn ji ava "mnemosyn"ê vedixwarin. Wisa bawer bûn ku di wê avê de giyana demê hebû. (*Walter Ong*)

Mnemosyna helbestvanê Kurdan; qetlîam, kuştin, zindan û zor û zehmetî ne. Çawa ku helbestvanê hêja wiha dibêje:

*"tu dizanî ji çiqilê dara jiyanê*
*çiqas belgê bêmiraz diweşiyan"*

Çiqas aşkere ye ku van peyvan ji destên cedewî derketine. Û çiqas xuyaye ku mnemosyna me bêmirazî ye.

Kekê Seyfedîn; şahidê şîn û êşa gelê xwe û zimanê hesret û kedera evîndara ye; bi vê wateyê dengbêjekî Kurdan ê modern û helbestvanekî hêja ye.

Bi hêviya berhemên nû helbestvanê qedirzan û qedirbilind pîroz dikim.

***Jîr Jan Amedî***

**Seyfedînê Welekorî (Seyfettin Temel)**

Di sala 1960'î de li bajarê Mûşê, navçeya Melazgirê; li gundê Welekorê hatiye dinê.

Navê bavê wî Ebdulbarî, Navê diya wî Hezîme Xanim e. Ji Eşîra Hesena, çiqa Malbatê ye. Malbata wî ji malmezinê gund e malbateke welat perwer e.

Di heft saliya xwe de dest bi dibistanê kiriye. Dibistana seretayî li gundê xwe xwendiye.

Li ba bavê xwe û carinan jî li ba melayê gund, li mizgeftê perwerdehiya Erebî dîtiye.

Di xeyalên Seyfedîn de tim azadiya welat hebû. Lê belê di 16 saliya wî de wî zewicandine (27 Sermawez 1976). Xeyalên wî serûbin dibin. Di 18 saliya xwe de ji ber nakokîyekî berê xwe dide serê çiyan û sê salan li ser çiyâyên Kurdistanê dijî. Di Sebata 198'an de dîl dikeve destê desthilatdaran û wî diavêjin girtîgeha Melazgirê. Salekê jî di zindana Bajarê Osmaniyeyê de dîl dimîne.

Piştî derketina zîndanê, ji aliyê dagirkeran ve rihetiyekî nabîne û koçî Stenbolê dike.

Di salên 1990 de dibe endamê Partîya Gel (DEP) û dikeve nav siyasete. Sala 199'an di meha Gulanê da li Stenbolê tê binçavkirin. Di wê demê de gelek tade û îşkenceyan dibine. Piştî girtina Partiyê, endametiya wî betal dikin û pênc sal jî qedexeya siyasetê digire.

Di sala 2008'an da dibe endamê Komeleya Bawermendên Stenbolê (DİAY-DER) û niha jî di nav rêveberiya vê komeleyê de dixebite.

Di sala 200'an de dest bi karê nivîsa Kurdî dike û hin kurteçîrok, mesel, metelok û helbestan dinivîsîne. Heta niha bi sedan helbest nivisandiye.

Helbestên Seyfedînê Welekorî di gelek Kovar û rojnameyan da hatine weşandin. Gelek helbestên wî di radyo û televizyonan da hatine xwendin û hinek ji wan jî bûne stran.

Seyfedînê Welekorî, bavê sê kur û heft neviyan e û li Stenbolê dijî.

**Berhemên wî;**

Warê Wêran; Helbest, Weşanxaneya Kovara Ronahî, 2014, Stenbol

**E-mail:** seyfitemel@hotmail.com **Tel.**0532 652 51 43

**SPASÎ**

Ez ji ber ku di amadekirina vê berhema min de alîkarî dane û keda xwe tevlî vê berhema min kirine; ji birêz Berhîm PAŞA û Jîr Jan AMEDÎ û hevalên din ên ku keda wan tevlî vê xebatê bûne û bi fikr û ramanên xwe pêşî li ramanên nû vekirine re spasdarim.

**DIYARÎ**

Ez vê berhema xwe diyariyê dayik û zarokên malwêran dikim.

## PÊŞGOTIN

Helbestvan, Seyfedînê Welekorî; bi berhemeke nû û nûjen li pêşberî me xwendevanên helbesthez e. Di vê berhema xwe de jî; wek berhema xwe ya din gelek serkeftî ye û bi xebateke têr û tije xwestî xwe bigihîne me xwîneran…

Di vê berhema xwe de; zanîna xwe ya felsefîk û îlma oleke azad, kirî bingeha helbestên xwe.

Jiyana ku jiyaye beş bi beş di helbestên xwe de bi pênûsek pisporane û hestek têr û tije bi cih kirî. Hinek dengbêjî, piçek tehma helbestên klasîk û bi şêwaza helbesta modern; bi kul û derd, gilî û gazinc û hestek kurdewar, bi nêrîn û helwestek têkoşêrî helbestên xwe hûnaye.

Helbestên wî; wek pêlekanên meşa jiyanê ne. Dema mirov gav bi gav bi pêlekanan ve hilkişe, tehm û şêwaza helbestên helbestvaneke/î bi nav û deng xwe dide der û we xwendevanên hêja dibe li axa pîroz bigerîne!.. Çîrok û efsane, lorîk û zêmar, stran û dûrîkên welatê rojê di bin hişê we de careke din bi jiyaneke xeyalî be jî gav bi gav dide jiyîn; we li deşt û newal, war û zozan, çem û kaniyan dike mêvan!..

Ez wer hêvî dikim ku dê helbestvanê hêja Seyfedînê Welekorî bi berhemên xwe yên nû û nûjen dîsa bi me xwîneran re be. Bi hêviya xebatên nû…

Mevlut AYKOÇ

**Pênûsa Min**

min vê şevê gote pênûsa xwe
ka were li hember min rûne
bi dilê min ê sêwî û peneber re
têkeve nav galegal û xeberdanê
tu bibe şahîdê jiyana min a serhevde
ez bêjim tu binivsîne
bila ev şevareş me guhdarî bike
bila hîv û stêrk li esmanê jor
şopa kadiz li asoya bilind me temaşe bike
bila find û çirayên vê şevê
ji bextê me re bişewitin
pênûsa min binivsîne
hal û ehwalê min li ser vê axê
ka ez li kêjan heremê hatime dunyayê
ka min çi dîtiye ji destê vê qederê
tu binêre ez biçikarî û biçiawayî
di qasnaxê çerxafelekê re derbas bûme
rihê min di çend erdhejê giran de hejiyaye
û di çend warê hilweşiyayî de
min hêz daye û rabûme ser piyê xwe
çend caran di qetliaman de derbas bûme
çiqas biciwanî hatim qetilkirinê
binivîsînê birêje hubrê ji birîna dilê min
pênûsa min binivisîne
min çend biharên qerisandî dîtin
çiqas gul û kulîlkên
temenciwan tê de diçilmisîn
min çend havînên zuha û qelişî dîtin

li ser dilê min bûn qulixayî û xelayî
min çend payîzên ku
hêviyên min lê zer bûbûn dîtin
ka kî dizane ez çend caran mirim
tu dizanî ji çiqilê dara jiyanê
çiqas belgê bêmiraz diweşiyan
ka min çend zivistanên sar û bizemherî
ba û bagerbahoz û boran derbas kirine
çend çileyên dijwar jiyan li min tevizandin
pênûsa min binivîsîne
binivîsîne helbesta qedera min û ya xwe
çend stranan li ser bextê min bêje
çend axînên dayîkên dilbirin bilorîne
çend rondikan ji çevên bûkên rûbixêlî hilîne
ji bo destê wan zavayên bêmiraz hinê bîne
çend çîrokan ji kesayetiya Xecê û Sîyabendê Silîvî
lehengiya Dewrêşê Evdî û Edûlê
binivisîne ka çend keçên Êzidî li Şengalê
çawa cotên keziyên xwe kur kirin û
danîn ser kêlikên gorên dildarên xwe
çend destanên evîniyê
ji dîwana Mem û Zîn a Ehmedê Xanê
li ser evin û evîndaran binivsîne
hinek gazinên Melayê Cizîrî
ji bo Dîlberê di meyxaneyê de bimeyîne

hin caran Baba Tahirê Uryan bi bîra xwe bîne
ka weke Feqîyê Teyra av û av bêje û binivisîne
çend helbestên Mellayê Bateyê ji min re bixwîne
weke mamosteyê mezin Seydayê Cegerxwîn
biqîre û bêje hey hey kî ne em û em kî ne
pênûsa min binivîsîne
ka çend kilaman bi meqamê Evdala Zeynikê
dêrsim e xweş dêrsim e
û werî bê hekîmo bêje û bilorîne
çend çîrok û destanên cangoriyên
gele min bîne zimên
belengaziya Hesoyê Birîndar û Nazê ya jar
gavekî bibe Binevşa Narîn
bêje lorî lorî Cembelîkê min lorî lorî
emrê min biqurban o
û serê min bi gorî
te Cembelîkê Mîrê Hekarî
pênûsa min
de binivîsîne kesera dile Welekorî
dişewitim bi hesreta te tu Welatê roj û agirî
pênûsa min ez dibînim
ku hubra te qediyaye waye berbangê lêdaye
şev şikest lê dilê min hêj çar perçe ye

10.08.2017 Stenbol

**Biharistan**

biharistana min
biharistana welatê min
her deverên te bûye gul û gulistan
li rûyê te xwezayî şîn bûye
mêrg û çîmen vebûne
her alî kulîlkên reng bi reng
gul û nêrgiz şîn bûne
li her deşt û newalan
li her rûbar û berpalan
baxê lalezeran hatine raxistin
sor dikin wek xwîna Cangoriyan
kaniyên kenan derbûne
delav delav co bi co
wek rûyê dîlber û gulşenan
ji her alî ve jê evîn diherike
xwisiya şevê li ser gerdanê te
bilqok bilqok dibiriqî
meya eşqê diciviya
li nav xalên bin guharan
ez ê xwe bavêjim meyxana dile te
bang bikim li saqî
qedehek mey bîne ji xunava gerdenê
vexwim avjîna qedîm bimînim li jînê
li ser rûyê vê dunyê.

Biharistana min
stêrk ji ezmanê çavê te dibarîn
hîv ji şerma rûyê te çûbû ava
roj li hember bedewiya te
zer dibû weke şimayê diheliya
bayê qederê serxweş bûbû
çerxa felekê şikiyabû
çendik û çend milûk û şahînşah
textê wan wergeriyan
û taca serê wan ketibû
çend hezar alem hatin
jiyan li ser parzemîna te û çûn
çiqas dem borîn çiqas qîrne derbas bûn
Tenê Yezdan ma qedîm
yek jî tu yê qedîm bimînî heta dawiya dinê
baharistana min.!

20.07.2017 Stenbol

**Piştî Tu çûyî**

bayê deriyê dilê min vedikir
bayê bi ser min de digirt
tofanek li bextê min rabûbû
lingê textê bextê me şikiya
hîmê hucrika dile min hilweşiya
kes nebû mêvanê dilê min Gulê

piştî ku tu çûyî
mijê girte ezmanê dile min
ewrên reş kom bûn şêwirîn xem
gazî kirin hevkarê şevê
roj li min qedexe kirin
hîv ji min xeyîdî nema stêrka min
li ezmanê sayî Gulê

piştî ku tu çûyî
şevê tarî dinixaftin xweziyên min
cam û pencere li min hat girtin
çiruska ronikayê li min miçiqî
pifî çira mirazê min û te kiribûn
hêviyên min man di gewriya min de
bêhebûna te ne diçûn xwarê
hêsir ji çevên min gilor dibûn
dikişiyan rûbarê dilê min Gulê

pişţî ku tu çûyî
ev e halê min
kevok xeyîdîn ji hêlîna xwe
neban bûn kewên nikul sor
perperokên reş û spî firiyan
xwendina bilbila dengê dengbêjan
qediya ji baxê dilê min Gulê

pişţî ku tu çûyî
ez xeyîdîm ji bextê xwe
dûr ketim ji qedera xwe
hiş çû rih nîvî bû bêhêz ketim
mejî nema di serê min de
ez belengaz û sêwî
li ser şopa te bûme rêwî
bêxwedî û bê xwedan
mam li van diyar û kolanan Gulê
pişţî ku tu çûyî
pir xirabe halê min Gulê ax Gulê

19.04.2016 Stenbol

**Rihê**

serê min diêşiye
nizanim çima
şera şîrik rewşa kuman
dilê min bûye behra xeman
dilerizim wek tûra dor çeman
ji min neke gazin û loman

Rihê
qasekî li kêleka min rûne
bi ser min da bike bayê baweşînê
dilê min girtiye êş û eleman
evîna min diêşîne jana te
bûye derya xwînê
ez hesreta te
dikişînim li rûyê  dinê
evîna te li min bûye
evîna Mem û Zînê.!
Rihê
ez nexweş im nexweşê nav nivînan
cihê min çêke li şaneşîna jor
li ser xan û banan
Hîva çardeh şevî
bi hemd û bedewiya xwe
li evîna min û te temaşe dikir
li rû ezmanan

Rihê
derd û kulê dilê min
wek stêrkê li ezmanan
bi sehera sibehê re
wextê sela û azanê re
bi derketina  şewqa rojê re
bi dengê bilûra şivanan re

Rihê
hîna ku mirina malxirab
nehatiye ser vî canî
hêj ku taya lerzê neketiye
dest û lingan û dev û diranan

Rihê
awirê te li min didin
wek tîra derdikeve ji ser kevanan
serê dilê min dike hêlîna
xemû derd êş û janan. Rihê.

12.05.2007 Stenbol

## Bajarê Xeman Roboskê

dilê min bûye bajarê xeman
tax û kolanên dilê min diêşê deman
tev bi axîn û bi nalînin ji ber birînan
sî û çar birîn di dilêmin de çêbûn
sî û çar bedenên ji canê min ketin axê
sî û çarcaran ez mirim li ser berfê
ez bûm sî û çar dilê dayîkên birîndar
ez bûm sî û çar şerê reş bi ser keziyên
keç û bûkên Roboskê de hatim xwar
ez bûm xençerek a bijehr û zengarî
li ser sî û çar dilê bavê birîndar
ez bûm sî û çar gulê çilmisok li ser berfê
bi derba neyaran ve ketim axa sar
hey hewaaar hey hewaaar
ji Roboskê re hey hewaaar
bajarê dile min Roboskê hate xwar

28.12.2016 Stenbol

## Hatina Te

hatina te bi xweşî bû
bi şahî û gul bû
lê çûyîna te
pir bi êş û keder bû
lewra dilê min li pey te bû
te dabû dû nesîbê xwe tu hatibû
bi hatina te dilê min pir şa bû
lê te da pey qedera xwe û tu çû
te dilê min bi kul
çevên min şil hiştibû
tu nizanî te li pey xwe
çiqas dil wêran kiribû
û çiqas çevên bi hêsir
tevî hêviyên miçiqî hiştibû
di birqa şevên tarî de
tu wenda bûbû berxê mino
de
lorî lorî lorî berxê mino lorî
ax lorî lorî lorî Ehmedo lorî

04.07.2017 Gomik

**Bêdewletî me**

ji min ne pirsin nebêjin tu çawan î
ez weke Kurdistanê par parî me
weke Kurdan tim û tim kuştî me
ez ne lal im dest girtiyê welatî me
bêzar û ziman ez bêdewletî me

li Enfalê bi hezara li gorê tomarî me
ez kuştiyê bêhna sêvan a li Helepçê me
weke Mihabatê ji emirkina me
qazî Mihemmed im li meydana çarçira
li bin sêdarê de ez bêdewletî me

li newala qesaba bin latan de veşartî me
di bin bîrên asîtê de hestiyên helyayî me
li Roboskê sî û çar canê qetilkirî me
Şêx Seîd im li meydana Amedê
di bin sêdarê de ez bêdewletî me

ji min nepirsin nebêjin tu çawan î
weke Cizîrê li ber şetê firatê tî me
li Şirnexê xemla bûkên huznî me
axîna dayikên birîndar li ên Geverê me
kuştiyê bin zulmê ez bêdewletî me

li Sûrê di bin jêrzemînan de qetilkirî me
ber minara çarling berdêla azadiyê me
weke Licê li pêş çevê elemê talan bûme
li Nisêbînê taxên xirabe û dorpêç kirî me
girtiyê welatê xwe ez bêdewletî me

ez kuştiyê qetlîama Geliyê Zîlanê me
li Dêrsimê  komkujiya Elawiya me
li kolanên Gimgimê weke laşê tazî me
li Xarpêtê qada gênim wek Seyid Riza me
di bin sêdarê de ez bêdewletî me

li şengalê kuştiyê fermana heftê û çara me
li rojava weke Kobanê dorpêçkirî me
ji xwehên xwe qetyayî Weke Efrînê me
wek zarokên reng esmer bêhêvî me
li sînemaya Amûdê di nav agir de şewitîme
ez Kurd im li rû vê cîhanê bi milyona me
lê ez bêdewletî me

31.08.2016 Stenbol

**Agirê Nava Min**

keçê delalê
vê şevê peyvan
ji dilê min fîrar kirine
ne helbest mane
di hişê min de
ne jî stran têne bîra min
tenê bejn û bala te
û husn û cemala te
tê ber çevên min
jixwe ew jî bes e
ji bo agirê nava min

8.07.2017 Stenbol

**Lê Tu Çûyî**

gewrê
ez mame sêwî
şev ji min
ez ji dilê xwe
bûme bêzar
tim li pey te
dike qêrîn û zarezar
ez mame sêwî
ew bû dîlê stûxar
hey hewar û hewar
gewrê hey hewar
dema min got neçe
wext nemaye roj bû êvar
reng û dengê te
dil û hinavê min anî xwar
lê tu çûyî
hey hewar

## Ax Cizîra Min

dîsa neyaran dor li te girtin
kuştin xeyalên te kîna min dirand
dîsa te ji nava dile min êşek firand
ji ber êşa te dil û ceger li min xwîn rijand
dîsa te şevê bêwayîk li min pêçand
dengê çeka neyar bi ser min de difîqand
qêrîna dayîkan dengê Zarokên sêwî
zilma şevên bêdawî dihejand
bedenên biçûk di nava kefen de
xewnên mirovahiyê radiwestand
zarokên te dîsa wek salên nodî
bi yek carek serî netewand

ax Cizîra min
ax Cizîra min tu bû Enfal
li ser te qetlîam kirin
ax Cizîra min tu bû Kerbela
av li ser te miçiqandin
ax Cizîra min tu bû Kobanê
zarokên te yê reng esmer qetil kirin
ax Cizîra min tu bû Etopya
çira jiyanê  li ser te vemirandin
li ber qeraxê şetê Cizîrê  tu tî hiştin
xerabkirin rewşa te jîyan li te miçiqandin
dilê Mem û Zînê agir pêxistin şewitandin
nalîna Melayê Cizîrî bû ji ber êşa te
derd û xem bûbûn helbest dicivandin
xem neke Mem şîn neke Zîn menale Cizîrî
zarokên we li ber neyar serî netewandin
dîsa dîsa serhildan bijî bijî Cizîra Botan

13.09.2015 Stembol

## Dêrsim

*Ji bo bîranîna Qetlîma Dêrsimê*

îşev dilê min bûbû wek Dêrsimê
bûbû nefiyê şikeft û newalan
dilê min qetilkirin li ber avan
kezeb li min parî parî
li ser bedena min derbên neyar dibarîn

dema ku Dêrsim tê gotin
çi tê bîra te lawo

çend qêrîn
û çend nalin
çend axîn
an çend hewar
çend cure mirin tên bîriya te gelo

Pîro kal bû
Pîro westiyayî bû
Pîro ji ber çerxa felekê êşiyayî bû
Pîro ji qedera xwe ne razî bû
Pîro birîndar û evîndarê welatê xwe bû

dengek hat di bine gelî de
digiriya dilorand û diqêriya
hêsîr dibarand li ser zarokên nîv rihî
digot de lorî lorî
berxê min o lorî

reşika çevê min rijiya ji girî
ji dilê min xwîn dikêşî
çemê Munzûrê pê re digirî

digot wey Xwedê o
ev çi zulm e ev çi tofan û xezeb e
te kiriye para me Kurdan
ma gelo çi gunehên me hebû
li şûna şîr zarokên me
ji berên dayîka xwînê dimêjin îro

hêviyên min ji hev reviyabûn
rihê min bûbû dîlê destê zaliman
hebûna min avêtibûn zîndanan
laşê min li meydana gênim
li bin sêdarê li ba dibû

bûkên serî bi xêlî
xortên dest bihinne
bi hevûdo ve girêdane
kalê rû spî
pîrê por bihinne
bi tevahî dane ber gullane

wê çawa here ji bîriya min
dagirkerên xwînrêj digotin
heyfa gulleyên wene
hûn ê di şûna gulleyan de
serê wan bipelêxînin bi dar û çoyan

ya ku min bi çevên xwe dît
ne tofana Nebî Nûh bû
ne jî êşa Eyyûp Pêxemberê kurman xwarî bû
diranê keftaran di canê min da çikiyabû
qijik û eyloyan laşe min dixwar

law darda kirin li ber çevê bavan
ez ê çawa aqil navêjim
dîn û har nebim hey Xwedêyo
ev çi derd e ev çi tofan e
qet li ser rûyê dunyayê
wekî me kesek tune ye
li hemberî min cinazeyê xortê hevde salî
min mirina kurê xwe bi çevan dît
ez im Seyîd Riza kalê heştê salî
bûme şahidê vê birînê
çiyan bi min re axîn dikirin
nalînên çemê Munzûrê bû
li ser birîna min
ax dikir bi min re digriya
erd û ezman ji ber zulmê dilerizî
ax dîsa xayînan ez firotim
bi erzanî û bi îxanetî

bes êdî bila hişyar be Nûh ji xewê
xweza bûye derya xwînê
bawer bike ew ê gelek poşman bibûya
ji ber ku ewî mirov
suwar kir li wê keştiya hane

gazî bike qewmê Lût
bila xweziya xwe bînin bi wê halî
ji bîr neke Eyyup Pêxemberê kurman xwarî
Îbrahîmê di bin kozên agir de mayî
bila ew jî bibinin
vê zilm û zordariya hov
li ser serê me Kurdan
çend caran tofan qewimîn

04.05.2017 Stenbol
*bi alîkarya Enver Çetiz*

## Bêrîvan

ka te sozekî ji bo min dabû
tu yê rojekî di rojên biharê de bihatayî
min û te me yê destên hevûdû bigirta
em ê bireviyana çol û çolistanan
me yê wan deştên fireh xilas bikira
me yê xwe biavêta pêsîra çiyan
li nav gul û sosinên bêhn xweş
û kulîlkên reng bi reng
û me yê bi azadî bêhna catirkê
bikêşanda cegeran wer bi dilxweşî
û ji bo ku em azad bijîn û bi axivin
min ê qala wî agirê hesreta te
ku çawa hundurê min dişewitîne bikira

dûrî qehr û kînê û dûrî loman û fênan
ji rikê dijminan re û ji rikê diz û talankeran re
ji rikê dagirker û înkarmendan re
û ji rikê mejûyên qirêj û wan cambazên durû re
ji rikê wan kesên bêbawerî û minafiq re
ji rikê baziganên dînfiroşan re
û ji rikê siyasetmedarên virekên bêşeref re
wan kesên ku mirov û mirovahiyê
diperçiqînin ji rikê wan re
dîsa me yê qala aşitiyê û biratiyê bikira
qala hezkirinê û hezkiryan û qala evîn û evîndaran
qala ew ên ku nanên xwe bi hev re parve dikin
û qala wekhevîtiyê bikira
ez ê bi dengekî bilind û azad biqîriyama
min ê bigota tu evîna min î ez evîndarê te me Bêrîvan

min ê qevdek gul û kulîlkên reng bi reng bicivanda
di nav de gul û beybûn û berfîn û binevş
û nêrgiz û yasemîn hin gulên din
di nava porê te yê reş de bihûnan da
û me yê li remla beybûnê meze kira ka hez dike an na
û ez ê bi ser te de xwar bibûma min ê di guhên te de
bigota
ez pir ji te hez dikim Bêrîvaaaaaaan

tê bîra te di wan demên berê de ez û tu
li hember gomên me yên jorin
li ber diwarê hilweşyayî te ji bîrê av dikêşand
û min jî ji te re qala dilketina xwe dikir
ku ez çawa bûbûm dîlê ber dilê te
û bi çi awayî agirê eşqa te min dişewitîne
weke mirovekî dîn diçûm dihatim

bû hîkehîka te dengê kenê te
diketin newalên Welekorî
tê de olan didan û li hev digeriyan
û di nav mejûyê min de dikire xûşexûş,
di nava dilê min de erdhejînekî neh pîle hejiyabû
laşê min ji ber dilerizî weke taya zelzelê
min bi dest bi dest ji serê xwe de derbe xwaribû
weke derba şeşagirekî yek derbî
li ser laşa min birînên xedar vebûbûn
ku tu car nedihatin kew kirine

tê bîra te ew teyr û tûtiyên li ser çiqilê darê
ku bûbûn şahidê evîna min û te
tev xeyîdîbûn û firiyan û çûn
ew perperokên reng bi reng
ku li dora agirê evîna me reqs dikirin
tev di çenga min de bêdeng mirîbûn
wê çaxê min fêm kir ku ev hemû bûyerên diqewimin
tev agahdariya pêşiya rabûna tofanekê ne
û min hêjî ew tîqetîqa wî kenê te yê yekderbî
di paxila xwe de veşartiye,
ger em rojekî rastê hevûdu werin
û disa em bikevin dueloya eşqê û evînê
ez ê wê derba kenê te ji bo kuştina xwe bi kar bînim
Ji xwe roja tu çûyî neçûyî ez mirî me Bêrîvan
bête ez mirî me Bêrîvan

13.03.2017 Stenbol

## Hey Zalimê

îroj bûme mêvanê dilê te
mêze dikim li çata birûyên te
stêrkan berhev dikim
li ser tayên porê te
di hîverona vê şevê de
bûme rêwî li deşta singa te
li ser şopa kadizê xwe dikşînim
ber bi ronahiya wan çevên te
li singa min dixe tîrê awirên te
ez bûm birîndarê ber destê te
hey zalimê

21.04.2017 Mîlas

**Elîf ا**

çiqas nazik û nazenîn î wek rihanê
xwediyê bejna zirav taya bi tenê
serê hemû herf û peyva û gotinan î (elîf ا)
ev bi dem û rojan e ez li benda te me
min gote dilê xwe yê wêran wê (bê ب)
min (tê ت) da alîkî (sê ث) da alê din
(cîm ج) ê li hember min cihê xwe girtibû
hîkehîka (hê ح) bû bi halê min dikenîya
(xê خ) dikir xatir ji min bixweze û ji vir bi (çeچ)
xwe davêjim ber bextê (dal دَ) ê
hêvî û daxwaza xwe dikim ji (zal ذَ)ê
weke hêsîrek mame li dev (rêر) yê
qûz bûm tewiyam mîna herfa (zeynز) ê
çi janek çi êşek bêdawî ketiye (sîn س) ê
waye wek miriyame li ser min bike (şîn ش) ê
ez sond bixwim bi navê (Sat ص) û (dat ض) ê
nebinim wan rojên li pey me (tê ط)
dilê min ji bo te dikele wek kaniya av tê di (zê ظ)
zulfû ebrûyên te lê dixuyan wek (eyn ع) ê
bayê bedewiya te bi ser min de dihat
wek bayê xerbê di hejand (xeyn غ) ê zulfû xalê
(veڤ) naqete ji min ew derd û halê

(fe ف) lek neyar e min avêt pişta çiyayê (qaf ق) ê
noqî derya evîna çevê te bûme
(pêپ) min li ser pêla ye di dest min de maye (kef ك)
lal bûme (lam ل) û cîm ji devê min dernayê
(mîm م) bûye neyar (nûn ن) bi nuqteya xwe min diku (jeژ)
(hê ه) min xwe negihandibû deşta dilê te
(geگ) lek kesan giliyên min kirin li girê bê wayik
(wawو) ê ez avêtim bin dara (lamelîfأَلَ)
(yê ي) du du li bin ez û tune elîf

08.10.2016 Stenbol

## Ey Bayê Kur (1)

ey bayê kur bextê te me
perçek ji dilê min hilgire
bibe ser xaka weletê min dayne
dayne li bin qefika zinarên hişkewar
li ber çemê hecik li nava dehl û daran
bavêje nava coya ava kaniyên sar
û li rex baxçeyên ku hemberî mal û waran

ku nebû bavêje newala dedo
textê mêrgê li deşta xîz li bin daran
ez ê vexwim tasek av ji kaniya qicûrê
nava gul û sosin û kulîlkên biharê
li ber perê belekiyên berfê weke caran

ey bayê kur ku nebû min bigire bavêje
newala tarî li ber kendalê evdalan
bikeve guhên min dengê bilûra şivanan
li ber guhira pêz qeraxê çemê du avan e
bila bikeve serçevên min toza lingê karxezalan
li ser birîna dilê min bigere reng û xemla qîzan
bikewe bi tilî û pêçikên bêrîvanan
hey hawar gundî no hey hawar
bextê te me yarê min ji bîr neke tu car
li welatê xerîbiyê nemînim reben û stûxwar

ey bayê kur
çend dilop ji hêsirên çavê min
û hemêzek ji hêviyên heskirinê
çengek ji xwîna birîna min a ragirtî
tevî barana ewrê reşên avisî bike
bibe ser axa welatê min bibarîne
çengekî xweziyê min bavêje newalên kûr
çengekî bavêje kaniya bostanê Mexsê
bila reh bidin hêvîyên min xwe bavêjin pala girkavir
kulîlkên dilê min sor bibin li textê hewşan
hêviyên min şêwirkin li bin darê biziyan

ey bayê kur
ku nebû çend çilkan bireşîne li warê darê
bibe bahozek ji çiyayê banê bi jor de were xwarê
ez ê xwe bispêrim gera qulingan wek demên berê
qet nebû min bavêje nav rengê keskesorê
hêvi û daxwazên qedera  xwe û te girêdim
li navbera kaniya mirazan û girê kelehoçkê
ez ê rûnim li ser çiyayê xewrevîn li tehtê jorê
bicivînim sosin beybûn rihan û gulên narîn
bibin şahidê evîna min û te hîva çardehşevî
şopa kadiz koma sêwiya stêrka karwan qiran
ji kesera dilê xwe re temaşe kim li çemê şîrîn
Warê kevnare xaka bav û kalan û gundê Welekorê

14.07.2016 Stenbol

## Dil Çi Ye

delalê min ji te
dilê te xwest
te di berdêla dil de
emrê min xwest
delalê ma dil çi ye
xwînê dimije
û xwînê vedireşe
gava wusa ye
jiyana min ji bo çi ye
umrêkî min heye ku
min bi qurbana te kiriye
çima delalê çima…

2.03.2018 Stenbol

## Îroj Hewa

îroj hewa faşîst bîn dide
bîhna xwînê tê ji devê qatilan
ewrê îxanetê teletel digerin
ditirsim ku li ser welatê min
dîsa mirina bêwext bibare
dilê min dicemide rihê min diare
sal bêwext e li welatê min dem wêran e

19.09.2009 Amed

**Ey Bayê Kur (2)**

Bextê te me ka bilovîne
li ser deşta dilê min
ji bextê min re bike guveguve
bi alê xerîbiyê ve were
were
di ber hicrika min a hilweşiyayî re derbas bibe
bifîtîne ji serê min ê serhevde re
û bilovîne ji halê min ê xurbetê re
were were ji alê Bakur ve
hinek bêhna yarê bi ser min de bîne
bêhna yara min pir xweş e wek bêhna bihiştan e
Ey bayê kur ka were were
per û baskên xwe veke bi bal min ve were
ji alê Serhedê ve sirra sar bi ser min de bîne
agirê hisreta yarê ez şewitandim û tu wî vemirîne
ji bo dilê min ê birîndar hin kew melhemê bîne
çend dîmenan ji payîzên welatê min yê zerbûyî bîne
ji wan darên pelweşandî çend belgên weşiyayî bine
bila bêhna te û bêhna av û agir û axê jê were
bêhna gulên sor kulîlkên xunavî nû bişkivîne
tevî bêhna wan çiyayên azad ji min re bîne

Ey bayê kur gava tu hatî
li ser çiyayê xewrevîn hinek hokehoka şivanan
ji geliyê çemê hacik dengê bilûra bilûrvanan
û ji bêriya fêza mala bêhna bêrîvanan
dengê cotên elbê toqatî li ser xişr û bazinan
ji tendûra pîra Horê hinek bêhna kezebê pijandî
tevî çend îstekan çaya qaçax li ber kuçikê
Apê Hiso û çend hilm ji hesreta wî ya demkirî bîne
Ey bayê kur ka bi xwe re
hinek mij û moxana geliyê duavanê
çend bager û bahoza ji mehên zivistanê
hinek xewn ji şevên baharê meha adar û nîsanê
çend perçe ‘ewrê spî ji berê barîna baranê
çend gulên rû geş ji şoreşa Kurdistanê
çend kelekela havîna dilê Welekorî
çend salên xurbetê bide ber wî agirî
wan hesretên ku min li ber demkirî
bila dilê min pê re bêje û bigirî
Ey bayê kur gava tu hatî
li ser gorên bêmirazan hinek axa şewitî
hinek axîna dilê dayikên kezeb peritî
bi xwe re bîne sura sibê ji textê zozanan
hinek ava çemê Mûradê
hinek gulên sor ji ser çiyayê Qetewînê
tasek ava sar ji ber belekiya çiyayê Zêrnagê
û ji qûntara çiyayê Bilêcanê
hilgire û bi xwe re bine
ji bo dilê min ê war wendayê şewitî
bibe mêvanê birîna dilê min gava ku tu hatî
Ey bayê kur ka bilovîne û ka bilovîne

15.10.2017 Stenbol

## Wa Dîsa Bû Êvar

wa dîsa bû êvar li ser bextê min
ez ê derd û xemên xwe bidim hev
têkim berîka li paxila xwe
di ber pencera dilê te re derbas bim
bêdeng û bêhis herim
berê xwe bidime hicrika xweya tarî
destê xwe bidime ser
wê birîna xwe xwîn jê dibarî
ku jana welatê perçe bûyî jê diherike
Ji ber tenêbûna te ji şevên dirêj û tarî re
bi kesera dilê xwe yê hêsîr û dîl re
bêjim bilorînim û bilovînim
wa dîsa bû êvar
ez tenê mame bêmal û bêwar
belengaz û sitûxwar bêevîna te ey yar
Ji bêkesiya xwe re dikim hewar
bê te ez ji rihê xwe bûme bêzar
bes e naziya li min bike ey yar

16.11.2016 Stenbol

## Dayê

çiqas zor e ku mirov Kurd were dinê
dayê çiqas zor e
dide pey te qedereka reş bextekî xitimî
li te diqelibe xelaya mirovahiyê
qulixayî radibe li mirovahiyê
ji ezmanê cîhana te de rehm û şefqet nabare
birçîbûn û tîbûn perçebûn û peneberî
kuştin û firotin tim para te ye
îxanet û cehalet birakujî birîna herî mezin e
çiqas zor e ku mirov Kurd were dinê
dayê çiqas zor e
roj heye
ku tu li Dêrsimê werî qetilkirin
an li Koçgiriyê an li Meraşê
yan jî li Sêwazê ji ber ku tu Elewî yî
bi saxî werî şewitandin
roj heye
ku tu ji bo dîn werî kokbirkirinê
ji ber ku tu Ermenî yî an tu Suryanî yî
yan jî tu Ezidî yî bi heft û çar fermanan werî qetilkirinê
bibî sirgûnê destê reng û zimanê xwe
bibî hêsîrê destê mirovahiyê
werî firotin bi koletî li bazara rûreşîyê
çiqas zore ku mirov Kurd were dinê
dayê çiqas zor e

roj heye
ku tu li Roboskê werî bombebarankirin
wek Geliyê Zîlan
werî birînê bi jin û zarokan ve tevî kal û pîran
bibî dergûşa serê singûya celatekî xwînxwar
ji zikê dayîkekê biqelişî li ber çevê mirovahiyê
ji ber nijadê xwe û rengê xwe yê esmer
ma ev e mirovahî ma ev e edalet û mafê însanî
ger tu ji bo serhildanê rabî ser pîya
tu yê xayîn werî nîşankirin û bibî terorîst
çiqas zor e ku mirov Kurd were dine
dayê çiqas zor e
roj heye
ku tu bibî Şerzan
tu yê bi gulla qatilekî werî qetilkirin
hêviyên te û xeyalên te
wê bi te re bikevin nava qatê kefenê spî
bi gulên xwîna sor werin nexşekirinê
ku tu bibî Ceylan
wê gula te bi narincokekî biçilmisînin
û tu yê ji ser û rûyê xwe ve werî perçiqandin
xeml û xêliya te
wê bimîne di nav gul û sosinên çilmisî de
kî çizane dibe ku tu bi emrê donzdeh salî
bi sêzdeh gula werî oxirkirinê li ber çevê bavekî
çiqas zor e ku mirov Kurd were dine
dayê çiqas zor e

ew welatê ku te bi destê xwe çêkiriye
te tê de terorîst dibînin
hebûna te dikin qurbana hebûna xwe
zimanê ku ne para te ye kirine qedera te
jiyana te bi wî ve dane girêdanê
ger tu nexwazî an îsyan bikî yan tu girtiyî
yan tu yê werî kuştin yan jî tuyê werî koçberkirinê
li ser xaka kal û bavê xwe bibî hêsîrê ber derî û dertûlan
çiqas zor e ku mirov Kurd were dinê Dayê
dayê zor e ku mirov Kurd be li vê cîhana bêbextan
hey Yezdanê Gewre ma qedera me ev e
jiyana para me ev e ku em tim bêne kuştin û li vê dinê
şuxulê herî zor ew e dayê
tu dibînî çiqas zor e ku mirov Kurd were dine
dayê çiqas zor e

04.06.2016 Stenbol

**Porê Te**

çen tayên porê te
ew çend tayên porê te yê reş neba
min ê ew hesreta te çawa derbas bikira
di wan şev û rojên bêdawî de
ka were ji min bipirse
wî emrê derbas bûyî
min çiqas bêkesî
min çiqas belengazî bê te,
li van sal û mehan bar kiriye

di wan şevên payizên
bêdem dirêj û bi tenê
bi guveguva sir û bageran
di seqema serê îsnagan de
lûvelûva bayê bû
li ber qelşa pencera
hicrika min a hilweşiyayî de

bi şîrqeşîrqa birûskên
bi tirs û xof ku vedidan
hindirê hicrika min ronî dikirin
ew wêneyê te yê qermiçî
di ber eynika camşikestî de
bi min ve xuya kiribû
tînim ku gazî te bikim
lê ji tirsa tunebûna te
min serê xwe ji bin lihêfê ranedikir

min lihêfa xwe ya peritî
li serê xwe werdida
ji bêrîka xwe ew çend tayên porê te
derdixist diguvaşt û diguvaşt
ji xwe re dikir hevalê ber singa xwe
di paxila xwe ya bêmiraz de
ketim nav derya xeyalê pûç û wenda
pêlê li ser pêlan li min didan
bi ro de diçûm pêda pêda

24.08.2016 Stenbol

## Gundo

ax lo gundo
piştbirîno dil bikulo
Şahidê demên ser bilindo
ka werê ziman bibêje
ji bextê lawikê Serhedê re
zirav zirav birêse derd û kulan
kûr kûr birêje elemê ji birîna
birîndar e Welekorî ji dil xwîn dirêje
li ser warê te yê kevnare
hevokan lê dike helbestan dipêje

te çiqas xemgîniya min
di qefesa singa xwe de hilgirtî bû
tê de hê jî veşartiye zaroktiya min
berxevanî û şivaniya min
ciwaniya min û hezkiriyên min
hêvî û daxwaz tevî xeyalên min
bîranîn û xemgîniyên min
tev mane li ser erdnîgariya te

ax lo gundo
ecêbmayî mame tu hê jî ser piyayî
te ewqas derd û kul dîtin tu ne tewiyayî
ez kîjanê bibêjim kîjanê nebêjim
ji ber derd û kulan dîn û gêj im
carcaran dimeşim û carna dibêjim
ma tu nizanî ez evînek bê war im
dewrêşek pêxwas û ling qelêş im
carcaran eşqekî koçber im
carcara jî zeriyek bêmiraz im

ax lo gundo
de ka were ziman bibêje min
te xwar serê gelek bedew û rindan
ji nava êl û eşîran li ber çevê min
li qûntara çiyayekî bilin de
li ser welatekî çar stûn
di bin konekî reşî bê hedûr de
axxx gundo ez bimirim
bêrîvan êdî naçin bêriyê
ew dibin piling li tev refên azadiyê
xort êdî naçin zeviyê
ew dibin şêr hildigirin barê hêviyê

14.06.2014
*bi alîkariya Enver Çetiz*

**Gulistana Min**

çend û çend tofan rabûn
ji ser derya wan çevên te
çend Nûh keştiyên wan
noqî bûn ketin li bin pêlên te
çend û çend car ayet daketin
ser koyê cûdî ji ber pîrozbûna te
çend car te li çarmixê xistin
dîcle û ferat xwîn herikîn
şetê Cizîrê dikir axîn ji bo dilê te
çend û çend Nemrût li te xwedî derketin
çend Birahîm avêtin nav êgir li ser xaka te
çend û çend şahînşah çûn di erdê de
ji ber wan birq û birûskên te
Gulistana min çiqas bahoz û boran
diqulibîn ji kevanên brûyên te
çend û çend bager rabûn
ji ber xofa wan awirên te
çiqas ewrên reş kom bûn
li ser fitlên keziyên te
çend û çend birûsk bi heybet
diketin ji bin biskên te

çiqas tavikên baranê dibarîn
ji kûrahiya çevên te
bûn lehî rabûn ji newalên dilê te
çiqas kulîlkên bêmiraz diçilmisîn
li nav dar û daristanên te
çend û çend roj û şevên min
û çiqas sal û dem ji umrê min
ketin ber hêz û hêrsa dilê te
li deşta bin lingên te ez belav kirim
bayê bêkesiyê li min rabû
bûme çoleke hişk û zuha û qelişî
li pêş çevên min tu bi elem û êşî
derdê te dirêsim li ser nîk û teşî
dîsa dibêm av û av ji bo evîna te
heta kezeb li min bû çar perçe
gulistana min ez im li benda te

26.02.2017 Stenbol

**Hekîmo**

Hekîmo bextê te me
kulek wisa di nava dilê min de heye
hekîmo bextê te me
nêştirê lênexe wî derneke
wê êş û elema bêkesiyê
û bêwelatiyê jê der bibe
kesera xerîbiyê
nahêle ew birîna dilê min bikewe
ax halê bêwelatiyê
ez bûme xwediyê derd û kulan
êşeke wisa giran
di nava serê min de heye
Hekîmo bextê te me
xençerê lênexe wî bi der neke
wê derd û kulên penaberiyê
û belengaziyê jê der be
Ji ber jana bêwelatiyê
dilê min bûye çar perçe
ax halê bêdewletiyê
ez bûme hêsîrê li çolan
Janekî wisa pirr û giran
li ser welatê min heye
bextê te me Hekîmo

şûr lênexe wî birîn neke
wê derdê xayintiyê
û koletiyê jê biherike
êşa wî ji Rojhilat bigre
çûye heta Rojava
Ji Bakûr dest pê bike
heta Başûr tê de maye
ax halê bêwarbûnê
bûme miriyê gor û kêlan
îxanetê û cehaletê ew kiriye
sifra gur û hirçan û çeqelan e
xwîn û goştê me dixwin
bi destê xayînên nav me ye
Ji halê bêseroktiyê
nahêle ew birîn bikewe
ax halê bêwelatiyê
ez bûme koçerê nav holan

11.03.2016 Stenbol

## Keçika Cînar

ax keçika  cînar ax keçika  cînar
ez ji bo te  geriyame li gund û bajar
ji bo wan çevên reş ez bûme dildar
li ber dile te yê nazik bûme nobedar
deriyê dilê xwe li min veke keçika cînar

hê ku wext li min nebûye êvar
ay hewar ji destê te keçika cînar
ya star ji destê te keçika cînar
ax keçika cînar tu çima werbûyî neyar
ax keçika cînar te dil û hinav li min anî xwar
min ji destê eşq û evîna te pirr dît êş û jar
wan çevên reş belek ez kirim dîn û har
deriyê dilê xwe li min veke ax keçika cînar

hê ku wext li min nebûye êvar
ay hewar ji destê keçika cînar
ya sitar ji destê keçka cînar
ax keçika cînar
te sûret sorê memik weke hinar
ax keçika cînar dîtin li min bû yekcar
xweyê  bejna zirav gerdenî bihar
ji  awirê te birîndar bûm min tîra eşqê xwar
deriyê dilê xwe li min veke keçika cînar

hê ku wext li min nebûye êvar
ay hewar ji destê keçka cînar
ya sitar ji destê keçka cînar

08.07.2010 Welekorî

**Huzna Şevê**

gelo tu xeyalî an bûyî xewna şevan
Ji min biriye hiş û aqil bi wê tevger û livan
bûme mecnûnekî ketim çol û sewan
digerim li te Leyla  huzna şevan
gelo tu eşqî an agirî ji bo min rewan
cîger li min sotî  birîn nagire kewan
dikim qêrîn ji ber jana dil û hinavan
dibarin  rondikên  min her dem û gavan
bo eşqa te kor im ji herdû çevan
nabînim bejn û bala te huzna şevan
digerim li nav kulîlkên ber çem û avan
bêhna te tê ji nav baxê gul û sêvan
bîn dikim hesreta te wek hilm û hewan
diqîrim ji jana dil bi deng û devan
gelo tu xeyalî an bûyî xewna şevan
yan jî tu qederî ji ezelê birqê lêdan
nivîsand qelemê bi fermana Xwedê
di firdewsê de para min î huzna şevan

22.12.2015 Stenbol

**Kobanê**

ev bi roj û şev û deman e
hovîtiya wan ya hezar salan e
dor li te girtine cehş û hovan e
li ser te rakirin ceng û ferman e
bi gavekî nadin molet û eman e
li ser axa te vekirin birînê giran e
li hember neyaran şer dike wek şeran e
dengê zelal Viyan Peyman e
bûye cangorî Arîn Mîrxan e
tu car gav navêjin ji paşvan e
tu bû keleha berxwedan e
ji te re rêz girtin gelê cîhan e
warê egîtan ciyê şeran e
Kobanê sebra dilê Kurdan e

31.02.2016 Stenbol

## Navê Min

navê min Efrîn e
xaka min pirr qedîm e
dîroka min zêrîn e
zimanê min nerm û şirîn e
peyvên wê bi Kurdî ne
çevên min zeytûnî ne
kiraseke li bejna min e
ji xemza qîza belga hêşîn e
dilê min bi kul û birîn e
tev bi elem û keder e
neyarên min ereb û ecem in
serkêşê wan roma xayîn e
ne camêr ne jî mirov in
tev weke hirç û hov in
çewteçewta wane
weke keftaran e
nizanin ew der axa Kurdan e
hêlîna teyrêbazên li bilindan e
pir cangorî û egîtan e
ji bo wî canê xwe dane
bi sond be em ji bo te
canfeda ne canfeda ne

03.07.2017 Stenbol

## Menale

*Ji bo bîranîna birayê Sadiq Temel*

menale birê min menale menal keko menale
menale keko menale menal birê min menale
birê min xort e ne kale xerîbo ew çi hal e
mam bi hesreta te têm ew ne li mal e menale
xwezil bi gotina ev xewn û xeyal e menale
menale keko menale menal birê min menale
menale ezîzê min o ew çi hal e menal menale

lo bira ev çi hal bû çi hewal bû
ma nayê bîra te me bi hev re soz dabû
hêj rojê şahî û azadî li benda me bû
nebû birê min nebû çûyîn ne karê te bû
çi bikim ev teqdîra Rebbê Rehman bû
menale keko menale menal xerîbo ew çi hal e
menale keko menale menal birê min menale

ez qêriyam ketim kolan û sûkê
pirsa te dikim ji pepûka xwişkê
te çima xerab kir xemla qîzê danî xêlya bûkê
tu qetya ji koma bira bû mêvanê dayîkê
menale keko menale menal birê min menale
menale ezîzê min o ev çi hal e menale menale

tu Sadiq bû ji sozên xwe re tu Sadiq bû ji hevalên xwe re
tu Sadiq bû  ji birayê xwe re tu Sadiq bû ji welatê xwe re
tu Sadiq bû  ji nalînên  xwe re menale birê min menale
menale keko menale menal ezîzê min o ev çi  hal e
menale birê min  menale menale  xerîbo ew çi  hal e
menale menale birê min o menal menal  menale

11.10.2009 Stenbol

## Qamişlo

hêj serê sibehê zû bû roj li min çû ava
mirin dibarandin li ser bajarê Qamişlo
li hember Nisêbînê li ber çevên me tevan
dilê kurdistanê agir pêxistin wan hovan
çevê Kurdan şil e destên wan mane vala
kula Xwedê bikeve mala wan bêbavan
gur û kuçik li ser xwîna me bûne bira
axa me par parî kirin van hirç û keftaran
çiqas dem û sal e dilê min birîn kirin
ax derdê bêwelatiyê ji emrê min birin
çend dem û çend salan

min serê vê sibê xwe dabû benda rojê
lê tu derketî hemberê min berya tavdanê
bi wan mirinê bêdem û bêwext
ez nizanim tu ji bo me şerrî an tu qederî
ax derdê bêwelatiyê çiqas mirinên bêwext
dike çenga zarokên reng esmer û bêwelat
hêvî û xewn ji bin balgiyên wan difirîn
ji nava xaka wan dûr birin
Qamîşloka min

29.07.2016 Stenbol

## Ka Were

yarê
min îşev ji bo te
li ser agirê dilê xwe
helbest dem dikirin
min çend peyv
di nav agirê dile xwe de dikeland
bo hesreta te çend stêrk
ji ezmanê tarî dişewitand
di nav agirê vê şevê de
çend roj ji heyva sibatê diqurmiçand
diavite bin kuçikê wê evînê
hêj roj derneketibû
di navbeyna herdû birûyên te de
ka were
ji wê hesreta demgirtî re
li ber bîhna biskên te
em dilê xwe têr bikin ji evînê
ka were
yarê ka were

06.05.2017 Stenbol

**Mirin**

ma tu nizanî min mirin
di hemêza xwe de razandiye
ma tu nizanî ez û mirin
di şêmûkekî de tên û terin
ma tu nizanî ez ê çawa
ji mirinê bitirsim
mirina ku ez jê ditirsim birakujî ye
keko îxaneta birakujiyê ye

ma tu nizanî ez û mirin
di salekî de hatine dinê
ge ew mezin dibû li ser min
ge ez pîr dibûm li hember wî
carna dibû payiza pelweşîn
li ser demsalên welatê min
carna ez dibûm bahara rengîn
şîn dibûm li ser zeviya jiyanê

ma tu nizanî ev çend û çen sal e
ez û mirin ketibûn pêşbaziyê
wek cotek hespê kihêlên Hemedanî
geh ew diket pêşiya qedera min
geh jî ez diketim pêşiya bextê wê
lê min zanibû ku bextê wî tune
pir zarokên welatê min bêdem biriye

ma tu nizanî ez ê çawa
ji mirinê bitirsim
ma tu nizanî mirina ku ez jê ditirsim
tirsa min ji mirina bêdewletî ye
keko mirina herê zor bêdewletî ye
mirina ku ez jê ditirsim birakujî ye
keko îxaneta bira kujiyê ye

20.07.2016 Stenbol

## Tu Niha Li Ku Yî

gelo tu niha li ku yî çavbedewa min
gava tu çûyî derd û xem bûne mêvanên min

rûniştî li kêleka êşeke bijan
ber qeraxê çemê derdkêşan
te bi kêran parve dikir xem û kesaran
gelo kê xemê te dikir  nav gotinan
kê bi te re parve dikir êş û keseran
gelo kê kederên te dikir nav helbestan
kê lorî dikir ji bo evîna herdu dilan

gelo tu niha li ku yî çavbedewa min
gava tu çûyî derd û xem bûne mêvanên min

spî bûnê xwe avête ser û rûyê min
qerçimê xwe berda ser eniya min
tu zanî zuha û qelişî diman lêvên min
di her qelşekê de êşek bû rêhevalên min
hêsirên  şor kûr dikirin birînên min
jana tunebûna te dida nava dilê min
gelo tu nebî wê kî bizane bi halê min

wê ki evîna te têke nav kefenê min
tu nebî gelo wê kê were ser gora min
kê xweliya tunebûna te bavêje ser min
kê kê kê rinda min kê çavbedewa min

gelo tu niha li ku yî çavbedewa min
gava tu çûyî derd û xem bûne mêvanê min

04.14.2012 Stenbol

**Hesekê**

dilê min
wek demsala payîzê
zer bûye
hêviyên min
li ber bayê ketine
wek kelampera
geh li vê newalê
geh li wî kendalî
geh li bin koka
dirik û deviyanî
ken ji rûyê min
wenda bûbûn
çevên min bûbûn
şahidê mirinê
aliyekî min bûbû
xêlya bûka dest hinekirî
di nava gola xwînê de sor dikir
aliyê min ê din
bûbû gora zavayê bêmiraz
li rojavayê Hesekê

27.07.2016 Stenbol

**Rêwiyo**

wa rêwiyo rêya te
ketiye deşt û çiyan
jiyan datîne pêşiya te
bendav û kemînan
hay ji xwe hebe sed heyfa te
Wê te perçe kin wek gur û hovan

rêwiyo sêwiyo
xerîbo bêxwediyo
wa rêwiyo halê te çi yo

çol û çolistan
berî û daristan
payîz çû ma zivistan
serê rêwî kete
xax û perê giran
rêwiyo sêwiyo
xerîbo bêxwediyo
wa rêwiyo halê te çi yo

wa rêwiyo rêya te
ketiye deşta Mezrabotan
vebûne li pêşiya te
bax û baxçe û gulistan
Ji bo hebûna xaka te
azad bikin Kurdistan
rêwiyo sêwiyo
xerîbo bêxwediyo
wa rêwiyo halê te çi yo

çol û çolistan
berî û beristan
payîz çû ma zivistan
serê rêwî kete
xax û perê giran
wa rêwiyo sêwiyo
xerîbo bêxwediyo
wa rêwiyo halê te çi yo

14.03.2007

## Seydayê Min

*Ji bo Seyda Celaledîn Yoyler*

seydayê hêja pir xemgîn im
ji jiyanê xeyidî me hay ji xwe nîn im
bûme penaber li welatê xwe nîn im
dûrî min ketiyî hay ji halê te nîn im
gazina ji qedera xwe dikim ku li ba te nîn im
Ji çerxa felekê re pirr bi hêrs û kîn im
bînteng im ber xwe qet nabînim
çi bikim mirin fermana Xwedê ye
beyhûde bêçare me tu rê lê nabînim
wek tevahî rêhevalên te dilbirîn im
seydayê Melle Celaledîn ez pir xemgîn im
çi bikim tu tune yî ez ber xwe nabînim
şagirtekî dilbiêş û dilbirîn im
ger tu nebî ez ê helbestan ji kê re bixwînim
seydayê hêja, ez ê te tim bi bîr bînim
bi hezaran rehmet li cenabê te bînim

11.2013 Stenbol

## Ewrê Evînê

ewrê evînê girtine
ser zozanên me
bi ser konan de
barana evînê dibare
di kirasê vê şeva tarî de
birq û birûsk vedide
tîrên awirên te
li nava dilê min dide
dilopên xwîna min
diniqutî ser nîkê
qeytanê pûrikê dêreyê te
siya birûyên te
ketibûn ser qedera min
tavê germ nedikir bextê min
bi min re neyartî dikir
tîna xwe ji min vedişart
ez diqefilîm û diricifîm
li ber seqema awirên te
qeşayê xwe avêtibû ser dilê min
di şikefta zozanê me de
dîsa ez mabûm bi serê xwe tenê
di kîna wê şeva ba û baran de
li hêşiya konê derdkêşan
dûrî qibeqiba bêrîvanan
dûrî hokehoka şivanan
tevî kul û êş û janan

4.07.2016 Stenbol

**Te Digot Min Ji bîr ve Bike**

çima qey min
ji bo jibîrvekirinê ji te hez kiriye
ji te wetrê ji ber ku ez te ji bîr ve bikim
min emrê xwe li pey te xilas kiriye
min li pey te gula ciwaniyê çilmisand
xêliya kalaniyê da sere xwe
porê reş sipî kiriye
ewqas sal e dile min
ji bo jibîrvekirinê evîna te pişt kiriye
te digot min ji bîr ve bike
roj û hîv ezman û stêrk
ba û bahoz pêl û lehî
ji evîna min û te re bûn şahid
ku me sond û peyman çêkiriye
min ji te te jî ji min hez kiriye
ka ji min re bêje
te hezkiriniya min û xwe ji bîr kiriye
çima qey min
ji bo jibîrvekirinê ji te hez kiriye
ma ji bo jibîrvekirinê ye
min ji sibê heta êvarê
bendewariya rêye te kiriye
Ji ber ku gavekê ez te bibînim
tevahiya umrê xwe
li ser evîna te feda kiriye
te digot min ji bîr ve bike

agirê evîna te
girtiye nava dile min
wek kozên dara maziyê
temirandin ji bî rve kiriye
min şev û rojên xwe
li ber agirê evîna te derbas kiriye
ji ber ku gavekê ez te ji bîr nekim
min destê xwe
ji ser agirê evîna te ranekiriye
agirê evîna te
li ser dile min şopa birînan çêkiriye
te digot min ji bîr ve bike
çima qey min
ji bo jibîrvekirinê ji te hez kiriye
tê bîra te ku ez û tu rûniştin
li zozanên me yên jor
li bin dara evînê
li ser kaniya dilan
te qilçikê şara serê xwe
qelaşt bidarê ve girê da
daxwaza mirazê min û xwe kiriye
bi awazekî bilind tu qêriyayî
te digot
min ji te te ji min hez kiriye
ka ji min re bêje
te evîna min û xwe ji bîr kiriye
te digot min ji bîr ve bike
çima qey min
ji bo jibîrvekirinê ji te hez kiriye

24.02.2005 Stenbol

**Min Gote Gewrê**

min got lê lê gewrê
tu van diyara li çi digerî
gote min lo lo dîno
min wenda kiriye
mifta dil û derî
min got lê lê gewrê
were li dilê min bibe mêvan
ez ê mifta dil û derî
ji bo te bikim diyarî
serê xwe ji bo te bikim qurban
umrê min bi gorî
te xanim û xatûna kubarî
got lo lo dîno
dilê te dişewite ji ber evîna yekserî
nikarim bisekinim li ber wî ar û agirî
were dest ji vê yekê berde
ji xwe re neke bargiranî
wê bêjin gewrê bûye Leyla
mecnûne Welekorî

min got lê lê gewrê
tu ji bo min bilind bike
hêşiya kon û perda ye
ez ê bibim mêvanê dilê te ye
ez ê feda bikim birra mihan
mexelê hogeçan koza berxan
bo na ramûsanekî ji dev û lêvan
gote min lo lo dîno
dilê min çûye zozanan
ne li vê ye
de tu îroj here sibê zû bê ye
heft salan bibe şivanê berxan
heft salan bibe serkarê
nava malê ye
ji bo kevaniya bîne
agirê bin sêlê ye
ew çax wê bibe bihayê ramûsanê ye

min got lê lê gewrê
dilê min dinale
ji bo çavên reş û belek,
birûyên te wek hîlalê
gote min lo lo dîno
derdê te giran e
dilê te pê re dikale û dinale
ew ne xewne ne jî xeyal e
ez dizanim ew çi hal e

min got lê lê gewrê
hîva dilê min çûye ava
şev tarî ye
sterk melûl in
evîna me li ber mirinê ye
got lo lo dîno
lê agirê wî
hêjî di hilhile
min got lê lê gewrê
dil li min dişewite
bê te
ez di nav êgir de me
got lo lo dîno kê gotiye
gewrê neşewitiye û naşewite

08.06.2017 Stenbol

## Welatê Wenda

Welatê min ê wenda
ey mirovahî ev bû esra çendan
em Kurd in tên ji dewra qedîm dan
ne ji me re jî dibêjin qûlê Xwedan

qedera min a tî
bextê min ê birçî

siuda min a pêxwas
hebûna min a nenas

rengê min ê esmer
li dor zimanê min bûne çeper.

çavê min yên şil
dilê min ê bi xem û bi kul
li nav baxê dilê min şîn nabin gul
kundê bêwayik dixwîne li şûna bilbil

dîsa qada dilê min maye vikûvalan
nayê guhên min dengê şêr û şepalan
li ser axa welêt warê bav û kalan
tê xuyan şopa lingê gur û çeqelan

welatê min wenda ye bi salan
bûme penaber li ber konekî valan

02.03.2016 Stenbol

**Amed**

kî dikare hez kirina te
ji dilê min derxe Amed
qasî ku teyr ji firdanê
qasî ku ax ji baranê
qasî ku Kurd ji çiya hez dikin
ez ji te hez dikim Amed

îro li ser bajarê dilê min
bayê bêbextiyê difiqîne
ewrên bext reş giran kirine
barana êş û elemê dibarîne
paytexta dilê min birindar e
ji destê xayînan dike hewar e
ez bi can û rih benda te me Amed

qasî ku Kurd ji çiyan hez dikin
ez ji te hez dikim Amed

dîsa bû êvar li ser bextê min
kenan xatir xwest ji rûyê min
şeva xayîn hat bû cînarê min
ji bêrîka xwe derdixim çend êş û axîn
çengekî bêkesî hilmek tunebûn
dibine hevalê bêkesiya min
derdê te naçe ji bîra min Amed

qasî ku Kurd ji çiya hez dikin
ez ji te hez dikim Amed

11.11.2016 Stenbol

**Bêbextê**

dilê min ketibû ser şivarêya eniya te
ketim ser şopa wî li ser kevanê birûyên te
hey bêbextê lingên min şemitî
ez ji kendalê çavên te daketim xwarê
li dar û darçîtê qefesa singa te diketim
min destên xwe avête rehê dilê te
bi tevî hêviyên min ve qetiyan hatin xwarê
ez li bin newala bêkesan ketibûm
bi kul û keserê xwe ve tenê mabûm
rondikê çevên min zuha bûbûn
kaniya jiyanê li ser min miçiqîbû
êş û janan li hember min serî rakiribûn
di laşê min de birînên kûr çêkiribûn
ma bûme girtî li ber deşta dilê te
temaşe dikim li hîverona gerdena te
stêrkan dijmêrim li ser bircên navmilên te
destê xwe bide ser birîna min a xwîndayî
ji kulan re maç bike wan hêviyên min ê jandayî
hinek tîna dilê xwe hinek jî kenên rûyê xwe
dîrhemek jî kilê çavên xwe
çend têl ji bijangên xwe tevlî bike
pê jan û hesretên min derman bike
bêbextê

18.01.2016 Stenbol

## Bêmiraz Çû

ka binêre ez hêdî hêdî
ji warê dile te dûr dikevim
rêwî me hay ji xwe nîn im
tim bi axîn û keder û êş im
dil şikestî û xeyidî me
tim ji bo te hesretkêş im
Rebenekî qidûm şikestî
birîndarekî peritî û bêhêş im
Barê feqîriyê li ser pişta min e
ji newalên dilê te dikişim.
Şev û rojan ez rêwî me
bêçarix û ling qelişî me
serqot û pêxwas tazî me
feqîr û belengaz sêwî me
wek zavayê bêmiraz
li ber xêliyeke peritî me
Bihara emrê min qediya
gul û kulîlkên li ber bîna min
tev çilmisîn li ber bayê ketin
stêrkên esmanê min vemirîn
ne xew dihat ne jî tu hatî
ez tenê  mame li warê xirabe
li nav gorên bêmirazan digerim
min kevirê ber serê xwe dît
li ser nivîsandibûn eva jî
bêmiraz hat û bêmiraz çû

08.02.2017  Stenbol

## Dîlbera Min

dema ku te ez di xew de hîştim û çûyî
dilê xewnên min hişyar bûn
li pey te reviyan li dar û darçîtan
ta û benda têl û dirikan diqelibîn
dil û daxwazê min tev bûbûn birîn
tirsê girtibû ser hêviyên min kirine qêrîn
çavên bextê qedera min vekirî bûn
ji wê demê vir de ez qet xewnan nabînim
sedem ew e ku xew nakeve çavên min
gelo ez saxim an mirî me ez jî nizanim
dîlbera min ez jî nizanim

dema ku te ez di xew de hiştim û çûyî
çevê dilê min vekirî bûn
çavkaniyên xeman ji min der bûn
dilop dilop tenêbûn jê diniqutîn
ser kozîka emrê min ê peritî
li ser rûyê min ê kevnare de
birînên nû vedibûn
xew hat bû hevalê mirinê di wextekî tenê de
mirin hat bû hevalê xewnên min
dema ku te ez di xew de hîştim û çûyî
ji wê demê vir de ez qet xewnan nabînim
sedem ew e ku xew nakeve çavên min
gelo ez saxim an mirîme ez jî nizanim
dîlbera min ez jî nizanim

08.07.2016 Stenbol

## Dil

dil li ba te ye tu neke xeman
hilde pênûsê birêje hubrê ji deman
Bêje helbesta min û xwe
bi dengekî xweşîseda
belav be li nav baxê îreman
bilerizîne nava dilê min
wek perperoka devê çeman
metirse meke axîn û xeman
warê şîrîn Kurdistan e
baxê îremê li benda me ma

31.02.2016 Stenbol

## Êşên Min

ey êşên min ên bêbext û rûreş
hûn qet ji halê min şerm nakin
û ji Xwedê fedî nakin
xwe ji ser laşê min dûr nakin
va ye we goştê min xwariye
hûn ê hestiyê min çi bikin

26.09.2017 Stenbol

## Gewrê

gewrê wexta tu ji vî warî çû
lê çevên te mabûn li ser qibla min
min destnimêjek girt ji ava qudretê
secada xwe raxist ji bo daxwaz û niyetê
çok dan ber nûra wan çevên te
diayek daxwaz dikim ji Yezdan
tewafek nesîbê min bike ji wan lêvan
li dora çav û biriyan bigerim heft geran
bikevim rêya navbera qolincê û reş guliyan
heft caran herim werim ji bo daxwaza dilan
paşê biqusînim çend têl ji xema dilan
destê xwe vekim li ber Xwedayê dilovan
ji bo mirazê min û gewrê bêguman
serê xwe ji bo te bikim qurban
rihê xwe di rêya te de bidim wan
herdu çevan bibexşînim ji bo fitreyan
herdu destan bidim zekat ji bo mal û can
umrê xwe diyariya te bikim bêguman
Ji bo qeza û bela ji bo xêr û xêratan “Gewrê”

11.11.2016 Stenbol

## Hebestvano

helbestvano ka ji dilê min re
helbesta min û ya xwe bibêje
ger tu helbestvan û şair bî
peyvan li ser agirê dilê min bipêje
ger tu tembûrvan bî li têlan bixe
ji xem û keseran re strana birêje
ger tu şivanê êşa dilan û derdan bî
li bilûrê bixe min bike miya qera gêj e
bibe hosteyê dilê min ez im şagirtê te
ger tu nebî hosta wê şagirtên reben çi bibêje
dilê bêevîn wek beyaran li beroj e
tu kes lê nasekine ew xwe disoje
evîn ji dilê helbestvan re  dibêje
halê min bîne zimên ji dil bibêje
ger helbest ji kûrahiya dil navêje
wê rebenekî  wek min çi bibêje
ne pêwîste ku qelem hubrê birêje
xweşikbûna helbestê ne ji devê şagirt
ji kaniya dilê hoste  xweş davêje
hin caran dînekî wekî Welekorî jî
dibêje ez şair im û helbestan dibêje

26.01.2016 Stenbol

## Wê Ew Roj Bê

mirin min tu di xewna xwe de dîtî
di şeveke reş û birîndar de
qursekî spî li ser te bû
te danîbû nav ala xwe
û ser du daran ve li ba dikir
di ber çavê min re derbaz dibûyî
min sê dengan di guhe te de
dikire qêrîn û gazî dikir
bêdengbûna te bûye tirsa tunebûnê
û bi ser canê min de hatiye

di dawiye de dengekî hêdî û hindik
dihate guhên min got mala te xera be
û dengê mirine wek bayê serhildêran
ber guhên min re derbaz dibû
devdorê wê ala spî reş giredan
û li ser singa xwe defa mirinê dikutan
piştî rêzbûna mirovan reş girêdabûn
dîlana mirinê dileyîztin
xwîn li ber çavên min hêdî hêdî
teşiya mirinê dirêsîne
li rastekî ji çemek mezin dipirsim
avek şêlo hewar dikir
qîreqîra wî bû bi newal û deştan diket
di ber wî re xwîna birîna welatê min diherikî

tîrêjên rojê şewqa mirinê vedida
ser zarokên yek salî
û heta heftê saliyên welatê min
xwîn sor bûbû rengê  xwe dabû ser axê
ne karê mirovahiyê ye
ku wan însanên kedxwar
li ser bedenên kuştî xar dileyîzandin

ey cîhana bêbext ma qey tu ji bîr dikî
hêj ne li Geliyê Zîlan û ne li Newala Qesaban
û hêj gulek azadiyê li ser vê axê hêşîn nebûye
ser can û bedenên wan bêton diqerisandin
wan zarokên şîrmêj
li ber singa dayîkên xwe
bi heft derbên xençeran
û bi heftê guleyan hatin kuştin
ev çend ku çend sal e hêj bêhna mirinê
bilind dibe li ser xaka welatê birîndar
çend hezar dilên mirî di binê axê de
bi hêviya rojên azad û aramiyê mane
li ser wan goran û li ser wan bedenên mirî
çendik û çend hezar darê azadiyê
şax vedan û kulîlkên xwe vedane
dilê bilbilên mal wêran kul bûye
bi dengê pepûkên li ser dara bênav dixûne
em sond û peyman ji bo we dixwin
em ê heyfa wê xwînê rakin ji wan neyaran
an îro an sibe waye ew roj nêz e
wê ew roj bê wê ew roj bê wê ew roj bê

12.10.2016 Stenbol

**Hûn dizanin**

*Ji bo bîranîna Ehmed Akincî*

êdî dilê min navêje
waye ez westiya me
ji xwe çûme
qidûm şikestî me
û ji we dûr ketî me
di hucrika tarî de
bi hesreta wan rojê bê we
tevî kul û keserên giran
ji halê bêkesiya xwe re
gazin û giliyên xwe dikim
bextê we me
hûn ji min nexeyîdin
min hisreta xwe
û heskirina xwe ji bo we hişt
tenê tûnebûna we
û tevî kirasekî spî yê bêmil
li xwe dipêçim û
xemên xwe didim bin çenga xwe
li warên tarî dibim rêwî

hûn dizanin
êş êdî li min zorê nakin
ne şûr û ne jî xençer
nabire êdî vê keserê
tu kes nikare pêşiya min
bigire û min bi şûn ve vegerîne
ez ê xewn û xeyalên xwe
û tevî hisretên salên derbasbûyî
bi xwe re hildim bibim
têkim nava qatê kirasê xwe yê bêmil
û bila bibin hevalên
rojên min yên bê we
hûn dizanin li vira
derd û xem tune ne
êdî birînên min naêşên
bêhna min jî naçike
tenê bêriya we û gundê xwe
û dûrketina we hevalan dikim
min daye pey qedera xwe
û xwe sipartiye Rehma Yezdan
bûme mêvanê Ferîştehên
hesabê li gora tarî
Munkerr û Nekîr gotin tu kî yî
min gote wan ez Kurd im
li rû dinê bêcîh û bêwar bûm
koçberê xerîbiyê û penaber bûm
ka hûn bidine min hesabê
wan rojên bi êş û wê dûr ketinê
hûn dizanin ez êdî  dûrî we me
ji we pirr dûr im pirr dûr

19.03.2017 Stenbol

**Ey Bilbila Baxê Min**

ey bilbila baxê gul û gulistan
dayne li ser çiqlê dara mirazan
bibe mêvanê dilê min ê wêran
di dem û wexta serê seheran
bixwîne bi deng û awazê şalûlan
li nav xasbaxçê gul û sosinan

ey bilbila dil nazika şadûman
ey birûreşa ebrû weke qeytan
enîgevera awirtûja ji tîran
çevbeleka ji kanya hibr û kilan
sifet wek bedra li rû asîmanan
ziman şîrîn e ji levz û kelaman

ey bilbila li ser qesr û qonaxan
xuya dikî dema sehera serê siban
mislê heyva çardehşevî li ezman
ceger li min nede ber xençeran
were li dilê min ê kul bibe mêvan
ji min re bixûne şiêr û helbestan

ey bilbila li nav bax û rezan
singa te bostanê şemamokan
sûret sorbûye wek gulzaran
mest û gêjim ji bêhna wan
bide min maçek ji wan lêvan
kew bibin birîn ji êş û eleman

ey bilbila baxê esra zemên
dibe ku tu şubhetê Belqîzan
destê min de nîne xatema Silêman
gazî darxim li teyr û tûtiyan
ji bo te çêkim koşk û serayan
te deynim li ser tex û tacan.

ey bilbila li ser text û payan
ka rûnê li nav dilê minê wêran
bêje bilorîne ji bo evîndaran
emrê min li pey te bû rewan
Welekorî bûye hêsîrê deman
ji bo deng û sewdaya bilbilan

18.09.2016 Stenbol

**Ez Çiqas Têm Kuştin**

ax ez çiqas tême kuştin
wek duh wek pêr wek salên berên
wek demê borîn wek Enfal û Helepçê
li ber minara çar ling wek Pirsûsê
di dema havînan de ez kuştim
li ber germê hîştim,
xewnên min tî man li ber şetên Cizîrê
hêviyên min xet xetî bûn
nîvî man Efrîn û li Kobanê
nîvî jî man li Amed û li Artemêta Wanê

payîzan ez kuştim
xeyalên min yek û yek ji ber çevên min ketin
wek pelên daran bi ser min de hatin xwarê
bayê tofanê li xweziyên dilê min rabûn
kîna min dipijiqî newal û şikeftan
bêhna mirinê dihat ji welatê min
ax ez çiqas tême kuştin,
wek Cizîr û wek Silopiyê
wek Sûrê wek Nisêbînê

zivistanan ez kuştim
qerisîm mam di bin berfan de
hêviyên min sor dikirin li ser berfê
wek kulîlk û lalezerên welatê min
rondikên min herikîn ji ber kîna min
derdê îxanetê nediçû ji bîra min
Ax ez çiqas tême kuştin
bêkefen hîştim li kolanê Gimgimê
Laşê min kaş dikirin li pey maşînê
Ez bi hêsîrî hatim firotin li Şengalê

bihara rengîn de ez kuştim
hîştim li ber baran û tavan
tovê xweziyên min çûn di erde de
şax vedan her yek bû şitleke azadiyê
şîn dibûn li her deverên welatê min
min ji bîr nekin her roj werin ser gora min
ax ez çiqas pir têm kuştinê
min darvekirin li meydana çarçiran
wek Şêx Seîdê Pîran Şêxê Kurdan
li bazara genim wek Seyid Riza

ax ez dîsa bi ciwanî hatim kuştin
mirinê ez di seqemê de girtim dayê
tu dizanî êdî ez nacemidim wek berê
xwîna min li ser destan sor kir wek hinnê
bûme zavayê dest hinnekirî li Kurdistanê
xeyalên min man li ser berfê
ketim paxila xaka welêt
li parqekî Artemêta Wanê

13.01.2016 Stembol

**Hey Şevên Reş**

hey şeva reş û tarî
li me kurdan bikin bextewarî.
em gelekî mezlûm in
werin  bi me re nekin neyarî
dijminê me pirin
ereb û ecem û roma reşin bi dijwarî
destên me ji hev kirin
em kirine berxa guran xwarî
dar û daristan tev kirin goristan
xwezahî li me şewitandin
gund û bajar bi ser me de wêran kirî

hey şevên reş hûn çima xelas nabin
bes e tirs û xofê hûn qet ronî nabin
hûnê hertim kirasê gur û çeqelan bin
meydana hespê xayîn û neyaran bin
bûne xewnê xirab qet xilas nabin
bi tirs û xof di xewa zarokan de bin
qêrîn û fîxan nalîna dilê dayîkan bin

hey şevên reş
ma qey ê hûn bûne qedera Kurdan
we kon vegirtiye li ser herçar perçan
bira li birê mêze dike wek neyaran
çeper û hendeqan dikolin bi destê xayînan
Kurd bûne penaber hêsîrin li qampan
jehrê dirêjin li ser xaka Kurdistan
bibore ji ser me bes e ev zulma han
em jî dixwazin azadî wek hemû gelan
li ser xaka xwe wek hemû mirovan
nebin kolê hin miletan û dewletan

1.08.2008 Stenbol

## Ey Rebê Dilovan

ey Rebê dilovan
ey Xwedayê şev û rojan
tu Qadir î li ser hemû tiştan
dibînî halê me mezlûman
tu me xilas bikî ji zulma zaliman
em jî bibin xwediyê cih û waran
bibin xwedî dewlet wek hemû mirovan

lewra ji me re jî dibêjin însan
lazime ji bo me jî maf û jiyan
me nabê qetlîam û kuştin û talan
me nabê zilm û zor ê namûs bên firotan
tu li serme biguherînî vê qedera han
tu me sitar kî ey Xwedayê dilovan

Kurdistan nemîne biçare li dest zaliman
dor li welatê me girtine wan qatilan
agir pêxistine li ser gund û bajaran
xera kirin war bi war kolan bi kolan
dîrok û xwezahiya me kirine talan
ey Xwedayê settar û dilovan
tu me xelaskî ji zulma ecem û ereb û roman

24.10.2009 Stenbol

## Kaniya Dilê Min

min kaniya dilê xwe wenda kiriye
lê digerim bi şev û roja ye
roj ji rojê meh ji min boriye
ji we bipirsim gelo kê ew diye
jê re bêjin bila zû were ku ew kê ye
dil û hinav li min peritiye
bêjin Welekorî ji hesreta te ketiye
por spî rû qerçimî pişt xûz bûye
diran ketine çev kor û ziman lal bûye

min rêya jiyana xwe wenda kiriye
li pey wê sal û zeman û dem boriye
meh ji mehê demsal ji rûyê min çûye
hê jî min ew li ba xwe nediye
ji we bipirsim gelo kê ew diye
jê re bêjin bila zû were ku ew kî ye
bêjin Welekorî ji tûnebûna te dîn bûye
şewq ji çevan deng ji guhan û hiş ji serî çûye
kezeb qelişî hinav tî û dilê wî ragirtiye

min kaniya dilê xwe wenda kiriye
ji we bipirsim gelo kê ew diye
jê re bêjin bila zû were ka ew kî ye
ka ew kî ye

13.03.2016 Stenbol

**Kurd û Mirin**

Kurd û mirin çiqas dişibin hev
li rû cîhanê herdû jî bê welat in

hey qedera min ez çûme kê derê
mirinê beriya min xwe dabû wê derê
tu zanî mirinê qet hêşiya konê xwe
ji hêşiya konê min ranekiriye û neçûye

Kurd û mirin felqecêwî ne
qet bê hev nabin ji hev ne cûda ne
li rû cîhanê bi hev re rêwî ne
ji xelqê yek ji Kurdan deh birine
hey feleka malxirab ev maf nîn e

Kurd li ku derê be mirin li ber e
mirin li kê derê be Kurd li hember e
Kurd ji mirinê re bûne şênî û cînar e
mirin ji me re bûye gund û cîh û war e
ma ev jiyan e an ji bo me qeder e

mirin xwarineke bêtem e û bêdem e
tim li ser sifra mezlûman tisî maye
roj û şev dan û dem ji bo wî nemaye
geh li deştê geh jî li ser serê çiya ye
ji ber zordestiya zaliman tim para me ye

Kurdê xwedî şeref ji mirinê qet natirse
mirin jî ji Kurdê bênamûs qet napirse
tim li ser xaka Kurdistanê pisepis e
digere li nav mal û konan wer bêhîs e
mirin bêwext e wexta were kes pê nahese

mirin weke barana ewrê zelal û sayî ye
her gav û dema li ser wargehê Kurda ye
ji ber sedema bêwar û bêwelatiyê ye
ku mirina bêwext hewqas nêzî me ye

17.09.2016 Stenbol

**Delalê**

di wan demên ku tu
di bajarê dilê min re
derbas bûyî
lê şopa lingên te
li pala dilê min xuya dikir
wek şivarêyekî
piştî te çi baranek
girte ser kuçeyên dilê min
lê tu tofan
bahoz û baranan
ew şopa lingê te
ji ser deşta dilê min ne haşivand
û jê wenda nekir
li ser şopa lingê te
pir baranên demsalan lê barîn
delavê pez koviyan
lê vebûbûn co bi co
karxezalan
jê ava giyanê vedixarin
ji bo miraz qedînan

Ew şopa lingên te
kulîkên reng bi reng lê vedidan
bêhna te ji nav belgên wan dihat
cemala bedewiya te dixuya
li ser belgê wanê xunavî
bayê qedera min
li dor şopa lingên te
digeriya û digeriya
xwe davê te beyta dilê te
tewaf dikir wê qiblegeha
nav herdû birûyan
û dia yek daxwaz dikim
ji mîrê mirazan
dê wêran û xalî nebe
bajarê dilê min
ji evîna te û evîndariya
hêviyên min sêwî nemînin
li ser şopa lingên te
û li ber dîwar û deriyan
delalê delalê delalê

28.06.2017 Sembol

**Lê Tu Nehatî**

berbanga sibehê re
hêj ku siya xewê ji nav kevanê navbera
bijang û biriya bar nekiribû
hêj xewna ji nav hişê min
koça wan dûr neketibû
hêj karwanê bêkesiyê tevî xem û êşên giran
ji xana dilê min ranebûbûn
hêj ku heyvê perda ser rûyê xwe ne nixavtibû
şewqa stêrkan hêj nevemirîbûn
bêrîvan hêj ranebûbûn ji hêşiya konan
nedihat dengê zengilê stûyê mîha qera ser beran
û ne jî hokehoka şivanên koçeran
tîrêjê rojê hêj derneketibûn
ji bin ewrên reşên ku tirs û xof barkirî
dilopên xunav li ser pelê gulê dilerizî
qiraviyê xwe avêtibû kendalê dilê min
tunebûna te di nava dilê min de diricifîn
wê demê hêj li ser vê axê behna te dihat
hêj şopa liv û tevgera te
rabûn û rêvaçûna te timtêl û xemla te
xuya dikir li ber şibaka dilê min
hêj hîkehîka dengê kenê te
tê li ser vî bajarî

di nava tiliyên te de
destmaleke heft reng li ba dibû
govenda te digeriya li ser bajarê dilê min
ser govendî tu bû tu bûbû sergovendî
ew roj çûbû ew dem borîbû
govend qediya bajar bêdeng bûbû
ez mame li hêşiya konê hilweşiyayî
tev qedera xwe ya bêdawî
û bi dilê birîn û êşiyayî
lê tu nehatî lê tu hêj nehatî

27.10.2016 Stenbol

**Mîro**

lo lo mîro
min ji te re ne got
ez birîndarê
welatê xwe me
derban li min nexe
bi destê neyara ye
wê sibe dîrokê bêje
xayînê mezin eva ye
lo lo mîro
ma qey tu nezanî
ji bo va çar quruş
pere û bazirganî
xwe û welatê xwe
nefroşe bi erzanî
mîro tu mîrê ji mala mîranî
mîrê ji mala Kurdanî
hey malxirabo tu ne layîqê
van gotinanî
lo lo mîro
ma te ne eqil û
ne sewda ye
te çima axa Welatê xwe
kiriye bin lingê
se û kuçika ye
lo lo mîro
ew karê tu dikî
çira ber kora ye
ma tu nizanî biratî

bêhempa ye
nebe dasa destê dijmin
nebire nijadê xwe
ew birayê te ne ne gihaye
lo lo Mîro
were vê yekê meke
Wellahî ne wisa ye
neşewitîne dilê Kurdan
şa neke dilê neyara ye
lo lo mîro
ez birîndarê welatê xwe me
neyaran
dor li welatê me girtine
agir li ser me dadane
her der kirine wek Dojeh e
alîkî me rom e
alîkî me ereb e
alîkî me ecem e
lo lo mîro
dujminê me yek e
bextê te me tu ji bo wan
nebe pira ser çem e
ji bo te namîne
tu şeref û namus e
hey malxirabo ev çi hal e
serê xwe rake
pir eyb û pir şerm e
lo lo mîro mîro mîro

27.04.2017 Stenbol

**Nalînek Tê Ji Kêleka Min**

ziman li min nagere ez çi bêjim
ji ber êşa Şengalê ji dil xwîn dirêjim
ne sax im ne mirî me bêhûde ker û gêj im
ji derdê Şengalê re lorîna dibêjim
şûna rondikan ji çevan xwîn dirêjim

birano nalînek tê ji kêleka min
ka binhêre Şengal birîndar e birê min
xwîn diniqute ji nava dil û hinavê min
de hûn gaziya min bigihînin Kobanê
tenê ew dizanin bi halê birîna min
Şengal bû nalînek li ser dilê min

nalînek tê ji bêkesiya halê min
Şengal bûye êş û elema nava dilê min
ji zulma neyaran nakewe birîna min
xelkê Kurdno bibînin derdê min
qêrîna dayikan naçe ji guhê min
hewar paymal kirin namûsa min

zarok bênefes bêrih man li kêleka min
hevalino nalînek tê ji kêleka min
Şengal birîndar e li ber çevê min
xwîna bêkesitiyê tê ji birîna min
xelkê Êzidî di nav de xeniqandin
qêrîn û hawara min bigihînin Qendîlê
ew dizanin bêkesitiyê û êşa min.
heftê û çar car e der dikin birîna min
qir dikin Xelkê Êzidî li ber çevê min
hey hewar birîndar e Şengala min

ziman li min nagere ez çi bêjim
ji ber êşa Şengalê ji dil xwîn dirêjim
ne saxim ne mirî me bêhûde ker û gêj im
Ji derdê Şengalê re lorîna dibêjim
dêlve rondikan ji çeva xwîn dirêjim

21.11.2014 Surûç (Pirsûs)

## Şoreşger

ka stranekê bilorîne
di berbanga serê sibehê de
bila dengê te nericife
wek xençerekê wê li ser dilê min bikeve
dengê qêrîn û hewara te
bibe serhildêr bigire serê çiyan
serê çiyan bibin war ji te re
ji bo rêwiyê rêya azadiyê
sakoyê xwe bike lihêf
çeka xwe bike balgî ji xwe re
bêje Heval strana azadiyê
bi dilekî şewitî li ser navê Şoreşgeriyê
bi berbanga sibehê re
bayê bi ser min de difîtand
li ber koka darê
kulyên berfê yek bi yek
bi ser min de dihatin xwarê
bi tirêjên ronahiya tavê re
heval di rêya te de
sar û seqem ji bo min ne pêwîst e
wê rojekî çerx û dewran bizivire
li ser navê Şoreşgeran
binihêre ew çax tu li min heval

ez ê bikutim tovê di hêsin de
bêje heval strana azadiyê bêje
li ber bayê bakur di nav bêhna catirkê de
tofanek qetiya di singa min de
gujîna bayêkî har û dîn lê dida
dişkênand qeyd û zincîran
dibû rêwiyê rêya azadiyê
cixareyek qaçax pêdixist
bi rêveçûneke xof û şoreşgerî
du xelek xelek berdidan ber çerxa felekê
ser şiverêkê xiloxwarî heval
ez qet ber nakevim di şewitîn im
ewan ê ku min şewitandine
li pişt xwe nanêrim û minet jî nakim
terim wek rêwiyêkî rêya azad im
tim û tim çav li rêya te me
bi hêviya rojekî ku tu şûn ve werî
navê te sonda min e heval
tu yê tim û tim di dilê min de bî û bijî
û tim di çevê min de wek stêrka bi çilwilî
wek hesreta girtiyekî
ku li serê çiyan azadiya xwe bigere

29.09.2016 Stenbol

**Xayînê**

çi agirek di dilê min de dişewite
çiqas kul û keseran li ser dipêjim
çend ku çend derd û xeman li ser dikelînim
ev çend û çend hesretin li ber dem dikim
çend hoqe titûn e ez bi destê xwe dipêçim
û bi wan çiruskên tunebûna te pêdixim
çend û çend caran min hêsirê çevên şil
li ber tîna agirê nava xwe ez zuha dikim
ev çiqas sal û zeman in ku ez bêkesiya te
li ber pêtên wî li ser nîka teşiya umrê xwe dirêsim
kenan xatir xwestin ji ser rûyê min
peyv miçiqîn ji kaniya gewriya min
û dûr ketin ji ser lêvên min ê zuha bûyî
roj di qûlibî pişta çiyayê bêmirazan
hîv li ser deşta dilê min diçû ava
stêrk di kortika çevên min de dimirin
waye jiyan û hat dawiya emrê min
hê jî tu nehatî ser birînên min
xayînê hê jî tu nehatî

05.02.2017 Stenbol

## Qedera Reş

ma tu nizanî ez Kurd im
Welatê min Kurdistan e
ez yek par bûm min kirin çar perçe ne
ne ji min re dibêjin bûka ser bixêlî
Gulistana rojhilat û rojava
bakur û başûr ji bo min bûne zava
ez bi xwîna şehîdan hatime avdan
ji bo min pir bûn cangorî lawê bavan
ew kesê ji min re îxanetê bike
agir bikeve dilê wî mala wan qet ne ava

ez Kurd im tu wer bizan
yek serî me lê min heye pirr ziman
kirmanckî zazakî soran û goran
yek laş im ji du ling û ji du milan
milekî min sunnî ye yê din elawî
lingekî min asûrî suryanî yê din êzidî
di dîroka min de kêş ol û bawerî pirin
tev bi emr û fermanên Yezdan in
hinek li ser ola zerdûşt hinek jî xiristiyan in
hinek yahûdî, hinek jî misilman in
berê her tiştî em mirov û însan in
Ji me hinek ne lawê şêx an beg û mîran in
ne jî hinek ji me lawê xulaman in
rengê me esmer em nebiyê Kawan in
zimanê me qedera me ye em pê guman in
lê hûn vî baş bizanin em ne qûlê serokan
û nejî dibin xulam û koleyê eşîran in
em dixwazin yekbûn û azadî lewra em biran in

06.03.2017 Stenbol

## Piçûko

şirîno reng esmero ez bi qurbano
megrî ji derdan re melorîne û melorîne
dilê Welekorî agir pênexe ne şewitîne
kula Xwedê bikeve mala bavê neyarê xayîn e
agirê dojehê konê êla wan neyaran bixîne
qurbano çawa dilê te lawikê şirin dişewtîne
ew roj wê were van awirên te wê heyf û tolê hilîne
piçûko esmero şirîno megrî melorîne

megrî piçûkê min megrî melorîne
dilopê hêsrên teyê şor birînê dilêmin kûr kirine
tu megrî ezîzê ber dilê min melorîne
êş û kedera li ser dilê min ê birîndar ne civîne
bi wan awiran gur neke agirê hundirê min e
megrî tev raneke kul û kedera min e
megrî ji derdan re melorîne û melorîne
piçûko esmero şirîno megrî melorîne

wa ez ketime xwarê rihê min westiyaye
qidûm şikestiye hêz nemaye ji çokên min e
êdî ez deyax nakim megrî melorîne
xwîna min miçiqiye hêsrê min zuha bûne
bes e êdî birîna min xwîn neke melorîne
megrî ji derdan re melorîne û melorîne
piçûko esmero şirîno megrî melorîne

14.02.2016 Stenbol

**Ez Mirov im**

ez mirovahî me
ma hûn nabînin halê min

ma hûn nizanin xewa miriyan tê
lê belê xewa birçiyan nayê

we xeyalên min ji hev belav kir
xewnên min herimand
we umrê min ji min dizî
û zarokatiya min perçiqand
we ez bêrûmet kirim
û muhtacê dagirkeran û zaliman hiştim
we axa welatê min bêav hişt
we gula jiyana min çilmisand
bi jehra ku bêhna sêvan jê dihat
we ava kaniyên welatê min herimand
di dawiya dawî de we ez birçî hiştim
hey cîhana bêbext û rûreş
ey qatilên mirovahiyê hovên wehş
we çi anî serê mirovahiyê

ma hûn nizanin xewa miriyan tê
lê belê xewa birçiyan nayê

13.01.2017 Stenbol

**Zînê**

dengê te nakeve guhê min
êşeke giran digre ser rihê min
tirseke bêdawî dikeve nava dilê min
dibe ku tu min bi tenê bihêlî
bê te ez ê çi bikim li vê xerîbiyê
kesera dilê min î Zînê

li der dora xwe digerim tu tuneyî lê canê
ez ketim navbera du agiran li vê dinê
yek hesreta vê xerîbiyê mam bi tenê
yek jî tunebûna wan çavên te ne siltanê
bê kenê te ez ê çawa bimînim li vê dinê
şewata nava dilê min î Zînê

ketim ser şivarêya qedera xwe
bûm rêwiyê pey rêya bextê xwe
ketim newal û mesîlê çola dilê xwe
tevî  dar û deviyên ser rêya xwe
min tev kirin şahidê şewata nava xwe
agirê evîna dilê min î Zînê

Welekorî tim ji bo te biaxîn e
nava dil bûye êş û elem û xwîn e
xem û keser tev li ba wî kom bûne
hesreta wî ew e ku carek te bibîne
hezkiriyê dilê te ye tu ewî bizane
evîna nava dilê min î Zînê

ez dizanim ku tu Zîna Botanî
zeriyekî ji mala mîrê Kurdanî
hezkiriya ber dilê Şah û milûkanî
şewqa sitêrka bedra li rû ezmanî
bûyî tîrêja rojê li ser dilê min danî
roniya herdû çavan î Zînê

10.04.2016 Stenbol

## Xeyalperestê

lê xeyalperestê ez ê îro
suwarê hespê qedera xwe bim
rahêjim rima xwe ya deh movik
bidime dest xwe
şûrê xwe yê donzdeh ritil
bikevim nav derd û kederan
tevî kul û keseran
xem û xemgîniyan
û axîn û nalînan
îskeîsk û giriyan
hesirên li bin birûyan
hêvî û hesretan
jan û elemên nav birînan
û xeyalên tele û tel
tevî qedera ku ji min direviyan

berdime wan ji hev par parî bikim
ji havirdora jiyana xwe dûr bikim

serê kul û keseran gêj bikim
xem û xemginiyan ji hev belav bikim
axîn û nalînan kerr bikim
îskeîska girinê bibirim
hêsirên li bin biriyan zuha bikim
hêvî û hesretan ji bîr bikim
jan û elemên birînan kew bikim
û xeyalên tele û tel dîl bigrim
qedera ji min direviya ji nû ve xêz bikim

ji bona çav û birûyên te xeyalperestê
dinya çûye ji destê min ji bîr dikim axîretê
ez ê di nav xeyalê te yên tele tel de
xwe bavêjim dergahê meyfiroşan
di destê min de qedeha meyê
ji bona evîna te xeyalperestê

28.07.2016 Stenbol

**Pênûsa Şikestî**

tu çima nanivîsî vê zulmê
belê nanivîsîne
lewra mirovahî miriye
ji ber ê ku miriye Kurd e
li erdnîgariya Kurdistanê
çima nexş nakî bedenê tazî
li ser qada Gimgimê
xwîn dirije
li kolanê Silvan û Farqînê
wijdan Qerisiye
li Şirnexê
dil bûne kevir
li Sûra  Amedê
çav kor bûne
nabîne rewşa Silopiyê
ziman lal bûne
nabêjin ji axîna Nisêbînê re
guh Ker bûne
nabihîze qêrîna Cizîrê
çima tu nabînî çima tu nanivîsînî
nalîna birîndaran bi dengê westiyayî
dibêjin av av av û av
belê nanivîsîne
lewra ê mirî Kurdê nanivîsîne

31.01.2016 Stenbol

## Zarok

hay ji xwe hebe zarok
wê dijmin li te derkeve
hay ji xwe hebe zarok
qedera ne bixêr wê pêşî li te bigre
hay ji xwe hebe zarok
wê celat serî li ber te rakin
ditirsim ku xewnên te qetil kin
xeyalê te ji hev belav bikin
û hêviyên te perçe perçe kin
hay ji xwe hebe zarok
wa ye dagirker welatê te dagir dike
di wê tirsê de me ku hêviyên te tarûmar kin
û cîhê leyistoka te xerab kin
salê ciwaniya te kin û jiyana te qutkin
bayê babiloskê li te rabû
bireve zarok bireve
qeder roja xweş li ser bextê te venake
hawar hawar temenê te hêj pirr piçûke
ev dinya zalime te li ser axa xwe bicîh nake
hay ji xwe hebe zarok
pêlê deryayê ketine pey te ye
xewa mirinê ketiye çevê te ye
qeraxê deryayê ne hemêza dayikê ye
qurbano te tê de pal vedaye
ew der sar e xeyalên te çûn biroda ye

qîreqîra qaklîbaza ye
zarîna hutê bin behra ye
şîna te digerînin masiyê bin avê
bi birîna dilê bavekî penaber
û zarezara pêlê deryayê ye
li te digeriya zarok
zarok Alanê Kurda ye
ji ber zulmê reviya ye
xeyalên te xewnên te û emrê te
hêvî û daxazên te
ketin nav pêlên deryayê li pêş çavên
mirovahiyê
ez dizanim azadiya welêt bû hesreta te
li ber çavê me ma tenê bedena te ya piçûk
û navê te zarok navê te
navê te bû kedera me
hay ji xwe hebe
hay ji xwe hebe
zarok hay ji xwe hebe
neyarên te û qedera te
bi hev re bûne yek rê nadin jiyana te
Kurd û Kurdistanê tevan reş girêdaye
ji bo Alanê Kurda ye

30.08.2016 Stenbol

**Lê Zerî Dotmamê**

lê lê lê lêêêêêêê
ax lê lê lê  zerî dotmamê lê lê lê
lê lê zerî dotmamê mal xirabê
wez ê gul bûm gula xortê hesenan bûm
par van çaxa li cimuet û civata bûm
îsal jî pê re bendewar ê kofiya te me lê lê lê
lê lê zerî dotmamê lê lê ku hey lêê lê lê
zerî dotmamê ma tu nizanî ez ê xort bûm
ji xortan xortekî hêjdeh salî bi qed û qamet bûm
wez ê li welatê  serhedê xwedî êl û eşîra gêran bûm
siwarê hespê nêr xwediyê kihêlê hemdanî bûm
li gaz û bêlanê bilnd li ser şopa pezkoviyan bûm
gava diçûme raw nêçîra karê karxezalan
di kavilê goyê gund û bajaran re derbas dibûm
keç û xortê gundan tev bi hesreta tim û timtêla min bûn
ez evdalê Xwedê tim bi xem û keserên dilê te bûm
lê lê lê lêêêê lê lê
lê lê zerî dotmamê lê lê ku hey lê lê

ax lê lêêêê zerî dotmamê mal xirabê
qîz û bûkê Hesenan çev kilkirî  bi xeml û xêliyan bûn
li ber perdê cam û camekanan bi awirê dilan bûn
hinek ji wan rûniştibûn li şaneşîna jorê
na wele li şaneşîna jêr  li kêleka rewaqa sekinandî bûn
li ser dara lingan li banê qesra li bende min bûn
lê lê lê lê zerî dotmamê
te li bejna wana mêze dikir wek şitla tayê rihanê
ku hêşîn bibe li ber gola nazik û nazenîn bûn
di destê wan de gul sosin û kulîlkên awaz bi awaz bûn
ku bayê sibê lêdixist bi ser min de xwar û mêl dabûn
lê lê lê lêêêeê lêlê
lê lê lê zerî dotmamê malxirabê lê lê lê ku hey lê lê

ax lê lê lê lêêêê zerî dotmamê
alîkî rêya min konê reşê erebî li ser dozdeh stûnan kutayî bûn
alîkî  wî qesr û qonaxê mîr û hakiman  koşk û serayên rindan bûn
ser fêza wan çiyayê bilind zozanê sar belekiyên berfê bûn
malxerabê tevahî xas baxçê gul û sosin û nêrgizan bûn
li binê wî mêrg û çimen kulîlkê reng bi reng
weke nexşê xalî xalîçe û emeniyên sor û gevez bûn
di nav de çêkirî bûn kaniyên avê lûle ji lûle zêde bûn
hewz û quleteyînên ji mermerê neqişandî bûn
ax lê lê lê zerî dotmamê
birrekî qîz û bûkan çotê êlbên toqatî li milê wan bûn
gava tu mêze dikî li zend û bendê wan tev morî mircan bûn
bi xemlê qîzaniyê kum û kofî bi heft rengan girêdayî bûn
dêre û fistanê kesk û sor û zer bi ser bejna xwe de berdabûn
di mil milîn nava gul sosina de wek qaz werdekan biçalim bûn
lê lê lê lêêêêê zerî dotmamê lêêêê
lê lê lê zerî dotmamê malxirabê hey lê lê ku hey lê lê

ax lê lê lê lê zerî dotmamê
lê dotmamê malxirabê wez evdalê Xwedê hay jê nebûm
dotmamê tu nizanî ez heft saliya xwe de dildarê te bûm
di kavilê  goyê gundan de  malê  me cînarê  malê hev bûn
wey malxirabê welatê serhedê ba û baran sar û seqem bûn
ji bona ku tim te bibînim lingekî min li derve yek li hundur bûn
lê dotmamê ez bendewarê bejna te ya zirav nazik û nazenîn bûm
ez aşiqê  timtêl girêdana te ya şîrîn wan çevên te yên reş û belek bûm
zerî dotmamê ez nexweşê zar û zimanê te yê şîrîn bûm
lê lê zerî dotmamê malxirabê hey lê lê ku hey lê lê

lê lê lê lêêêêêê
ax lê lê lê zerî dotmamê lê lê lê
lê zerî dotmamê malxirabê
wez ê gul bûm gula xortê Hesenan bûm
malxirabê par van çaxan li cimuet û civata bûm
destmala destê qîz û xortan delalîkê ber dilê wan bûm
gula govendan denbêjê diwanan mîr û hakiman bûm
îsal ji pê ve bendewarê ber kofîya te me lê lê lê
ax de lê lê zerî dotmamê lê lê ku hey lêê lêlê
Lê lê lê lê êêêêê

02.05.2016 Stenbol

**Min Îşev**

min îşev ji kerbên te
şeva xwe kiriye sê beşan
bayê êvarê çevê min li rêya te bûn
min hêvî dikir ku tu werî
bibî mêvanê şeva min
deriyê dilê min vekirîbû
ji bo tu rêya xwe şaş nekî çend find û fener
di çenga xwe de pêxistîbû
min ji bo te çend û çend destan
ji evîna Dewrêşê Evdî û Edûlê
çend caran bûm Temo ketim nav stranan
min girt destê Evdalê Zeynikê
çend helbest ji dîwana Feqîyê Teyran
jimartibû ji bona çav û birûyên te
çend çîrok ji  evîna Mem û Zînê
Ehmedê Xanê ji bo evîn û evîndaran
amade kiribû
ku ez wana di guhê te de bikime pistepist

nîvê şevê bû
find û fenerên dilê min
li ber vemirandinê bûn
çevên min qerimîn li rêya te
birî û bijangên min giran bûn
xewa malxirab ez dîl girtibûm
neçar mame ketim nav xewn û xeyalan
li bin kêleka te ya çepê di deşta dile te de
di nav xas baxçeyê gul sosinên reng bi reng

li ser singa xaka pîroz
ji gulên kesk û sor û zer
min xêliyek ji bo rûyê te dineqişand
govendek mezin girtibûn
ji koma keç û xortan digeriyan
li dora bextê min û te
tu bûbû bûka Kurdistanê
ez bûbûm zavayê şoreşger li ser çiyayên azad

berbanga sibehê re
bayekî har û dîn li dilê min rabû
banê xana bextê min xerab kiribû
find û fenerên di çenga min da vemirî bûn
li ser hêviyên min de berfa Serhedê dibarî
sirê kêleka min a çepê biribû
xewn û xeyalê min tev tevizî bûn
dengê stranan ji guhê min qut bûbûn
pirtûka evîna Mem û Zînê qediyabû
fîncana qehwê vala mabû
li dîwanê qala Dewrêşê Evdî nedihat kirinê
helbest mabûn sêwî
dihat guhê min dengê bang û selaya melle
dikim serê xwe bilind bikim
serê min li kevirê gorê dikeve
min ewçax got heywaaax vê şevê ê mirî ez im

23.10.2016 Stenbol

**Nabe**

nabe birano weha nabe
dilê mino weha nabe
feleka xayîn carekê
çerxa me çep zivirandiye rast nabe
wellahî birano weha nabe
Rojhilat bê Rojava
Başûr bê Bakur nabe
em bira ne destê me ji hev nabe
rihê me yeke dilê me perçe nabe
axa me zêrîn e xirab nabe
deşt û zozanên me av û kanî ne
çiyayên me cenneta baqî bixwe ye
wargeha baz û pilingan e
dîroka me kevnar e yê hem û dîrokane
erd û ezman bûye şahidê wan e
nivîsandin destana qehreman
û navdarê Kurdan e
nabe birano weha nabe
Rojhilat bi êşa rojava şa nabe
Başûr bi qetlîamên bakur halxweş nabe

birakî têr yek birçî nabe
yek lawê xulam yek lawê mîran nabe
Xwedêyo kulekî li konê cahil û
nezan û kêm êqilan  ji nav me rabe
êşekî tarî girtiye ser mêjiyê wan
dikim nakim ronî û zelal nabe
mekin birano weha mekin
dilê mino mekin birîna Kurdistanê yek e
bi destê dijmin û xayînan der nekin
xwîna cangoriyên me pak û paqij e
bi galegal û gotênên xerab qirêj nekin
qedera me yek e rihê me yek e
çevê mino mekin xwîna me yek e
dostên me kêm in dijminên me gelek e
meke keko meke meke meke

15.07.2016 Stenbol